

Binyada ROLî di Lêkerên Têper ên Kurmancî û yên Zazakî da<sup>1\*</sup>

Kurmancî ve Zazakî Geçişli Fiillerde ROL Yapısı

ROLE Structure in Transitive Verbs of Kurmancî and Zazakî

Fahri KARACA \*\*

Zafer AÇAR \*\*\*

**Article Type:** Research Article // Gotara Lêkolînî**Received // Hatîn:** 07.07.2025**Accepted // Pejirandin:** 23.08.2025**Published // Weşandin:** 30.11.2025**Pages // Rûpel:** 1-25**DOI:** 10.55106/kurdiname.1737085

This work is licensed under the Creative Commons Attribution-NonCommercial 4.0 International License (CC BY NC)

<https://creativecommons.org/licenses/by-nc/4.0/>**Citation/Atif:** Karaca, Fahri ve Zafer Açar. Binyada ROLî di Lêkerên Têper ên Kurmancî û yên Zazakî da. 2025, *Kurdiname* 13, r. 1-25**Authors Contributions/Rêjeya Nivîskaran:** Data Collection: Author-1 (%70), Author-2 (%30), Data Analysis: Author-1 (%70), Author-2 (%30), Submission and Revision: Author-1 (%70), Author-2 (%30)**Plagiarism/Înfihal:** This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêr ji aliyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera înfihalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

## Kurte

Ev xebat *binyada ROLî* (ROLE structure) ya lêkerên têper ên kurmancî û yên zazakî di çarçoveya *teorîya ROLê* (ROLE theory) da vedikole. Teorîya ROLê yek ji binteorîyên *Teorîya Birêvebirin û Girêdanê* (Government and Binding Theory) ye ku ji aliyê Noam Chomskyî ve hatiye pêşkêşkirin. Her lêker xwedî naverokeka semantîk (semantic) e. Li gor vê naveroka semantîk her lêker dibe xwedî hin taybetmendiyên semantîk. Lêker van taybetmendiyên xwe li argumentên xwe bar dike ku lêbarkirina van taybetmendiyên semantîk wek *ROL* (ROLE) tê zanîn. Têkilîya argumentan û ROLên ku li wan tîr barkirin binyada ROLî ya lêkerê diyar dike. Di xebatê lêkerên têper ên kurmancî û yên zazakî li gor hejmara ROLên ku bar dikin û cureya argumentên ku binkategorîze (subcategorize) dikin hatine vekolan. Lêkerên têper ên kurmancî û yên zazakî sê cure kategoriyên argumentan binkategorîze dikin: *Frêza diyarkerî (FDI)*, *frêza daçekî (FD)* û *frêza tamamkerî (FTEM)*. Di xebatê da hatiye dîtin ku lêkerên têper ji aliyê hejmara ROLan ve du cure ne: *lêkerên du-ROLî* û *lêkerên sê-ROLî*. Lêkerên du-ROLî ji aliyê cureya kategoriyên ku binkategorîze dikin jî di bin pênc koman da hatine senifandin. Di encama xebatê da hatiye dîtin ku ji aliyê binyada ROLî ve di navbera lêkerên têper ên kurmancî û yên zazakî da bi rêjeyeka zêde, wekhevî heye.

**Bêjeyên Sereke:** Teorîya Birêvebirin û Girêdanê, Teorîya ROLê, Binyada ROLî, ROL, kurmancî, zazakî.<sup>1</sup> **Use of Artificial Intelligence:** No artificial intelligence-based tool or application was used during the preparation of this study.**Ethics Committee Approval:** This study does not require ethics committee approval, and the data used were obtained through literature review/published sources.\* Ev xebat ji ber vê tezê hatiye amadekirin: Fahri Karaca, (2025). *Berawirdkirina Lêkerên Kurmancî û yên Zazakî li gor Teorîyên ROL û REWŞÊ* (Teza Doktorayê ya Neçapbûyî). Zanîngeha Bîngolê Enstîtuya Zimanên Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî.

\*\* Xwendekarê Doktorayê, Zanîngeha Bîngolê, Ziman û Edebiyata Kurdî, Turkiye, karaca.fhr@gmail.com, Orcid: 0000-0002-7273-7859 /// PhD student of Kurdish Language and Literature, University of Bingol Turkiye, karaca.fhr@gmail.com, Orcid: 0000-0002-7273-7859.

\*\*\* Doç. Dr. Zanîngeha Bîngolê, Şaxa Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî, Turkiye, zafer13acar65@gmail.com, Orcid: 0000 0001 5323 9531 /// Assoc. Prof., Bingol University, Department Kurdish Language and Literature, Turkiye, zafer13acar65@gmail.com, Orcid: 0000-0001-5323-9531

## Özet

Bu çalışmanın amacı, Kurmancî ve Zazakî geçişli fiillerin *ROL yapısını* (ROLE structure) *ROL teorisi* (ROLE Theory) çerçevesinde araştırmaktır. *ROL teorisi*, Noam Chomsky tarafından öne sürülmüş olan *Yönetim ve Bağlama Kuramı'nın* (Government and Binding Theory) bir alt teorisidir. Her fiilin semantik (semantic) bir içeriği vardır. Bu semantik içeriğe göre her fiil bazı semantik özelliklere sahip olur. Fiil, bu özelliklerini üyelerine (argument) yükler. Bu anlamsal özelliklerin üyelere yüklenmesi *ROL* (ROLE) olarak bilinir. Üyeler ve onlara yüklenen *ROL*ler arasındaki ilişki bir fiilin *ROL yapısını* belirler. Çalışmada Kurmancî ve Zazakî geçişli fiiller yükledikleri *ROL*lerin sayıları ve yan-kategorileştirdikleri (subcategorize) üyelere göre araştırılmıştır. Kurmancî ve Zazakî geçişli fiiller üye olarak üç tür üye yan-kategorileştirirler: *Gösterici Öbeği* (GÖ), *Edat Öbeği* (EÖ) ve *Tamamlayıcı Öbeği* (TÖ). Çalışmada, geçişli fiillerin *ROL* sayısı açısından iki tür olduğu saptanmıştır: *İki-ROLLü fiiller* ve *üç-ROLLü fiiller*. İki-ROLLü fiiller yan-kategorileştirdikleri üye türüne göre beş grupta incelenmiştir. Çalışmanın sonucunda *ROL yapısı* açısından Kurmancî ve Zazakî geçişli fiiller arasında büyük oranda benzerlik olduğu görülmüştür.

**Anahtar Kelimeler:** Yönetim ve Bağlama Kuramı, *ROL Teorisi*, *ROL yapısı*, *ROL*, Kurmancî, Zazakî.

## Abstract

This paper investigates the *ROLE structure* of transitive verbs of Kurmancî and Zazakî within the framework of *ROLE theory*. *ROLE theory* is a subtheory within the *Government and Binding Theory*, proposed by Noam Chomsky. Every verb has semantic content. Based on this semantic content, each verb has certain semantic properties, which it assigns to its arguments. Assigning these semantic properties to the arguments is known as *ROLE*. The relation between the arguments and the *ROLES* assigned to them determines the *ROLE structure* of a verb. In the study, transitive verbs of Kurmancî and Zazakî are analyzed based on the number of *ROLES* they assign and the types of arguments they subcategorize. Transitive verbs in both Kurmancî and Zazakî subcategorize three types of argument categories: *Demonstrative Phrase* (*DP*), *Prepositional Phrase* (*PP*) and *Complementizer Phrase* (*CP*). It has been stated that, in terms of the number of *ROLES* assigned, transitive verbs fall into two categories: *two-ROLE verbs* and *three-ROLE verbs*. Two-*ROLE verbs* are analyzed in five groups based on the types of arguments they subcategorize. The results of the study have showed that the *ROLE structures* of transitive verbs in Kurmancî and Zazakî are highly similar.

**Keywords:** Government and Binding Theory, *ROLE Theory*, *ROLE structure*, *ROLE*, Kurmancî, Zazakî.

## Destpêk

Di vê xebatê da em dê lêkerên têper ên kurmancî (krm) û yên zazakî (zz) ji aliyê binyada *ROLî* (*ROLE structure*) ve vekolin. Çarçoveya teorîk a xebatê *Teorîya ROLê* (*ROLE Theory*) (wek  $\theta$ -*Teorî* ( $\theta$ -*Theory*) yan jî *Teta Teorî* (*Theta Theory*) jî tê zanîn) pêk tîne. *Teorîya ROLê*, yek ji binteorîyên *Teorîya Birêvebirinê û Girêdanê* (*Government and Binding Theory*) (*BG*) ye ku ji aliyê Noam Chomskîyî ve hatiye pêşkêşkirin.

Li gel *Teorîya ROLê*, binteorîyên din ên ku *BGYê* pêk tînin Chomsky (1982, r. 6) wiha rêz dike: *Teorîya X-Barê* (*X-Bar Theory*), *Teorîya Sînokêş* (*Bounding Theory*), *Teorîya Birêvebirinê* (*Government Theory*), *Teorîya Girêdanê* (*Binding Theory*), *Teorîya REWŞê* (*Case Theory*), *Teorîya Kontrolê* (*Control Theory*).

Berîya ku em *Teorîya ROLê* bidin nasîn wek peşamadekarîyek em dê behsa sê têgehên bi mijarê ve têkildar bikin: *frêz* (*phrase*), *binyada frêzî* (*phrase structure*) û *çarçoveya binkategorîzasyonê* (*subcategorization frame*).

Eger em bi awayekî giştî bêjin têgeha *frêzê* amaje bi pêkhênên (*constituent*) ji bêjeyan mezintir dike ku ev jî amaje dike ku *frêz* yekeyek e ku ji bêjeyan pêk tê. Bo mînak bêjeya *zarok* û *porxelekê* dibin yek *frêza zarokê porxelekê* pêk tînin. Riste ji bêjeyan pêk bîn jî wekî Haegeman (1998, r. 34) diyar dike, bêje bixwe *pêkhênên rasterast* (*immediate constituents*) ên risteyê ninin, lê pêkhênên *dawîn* (*terminal*) ên risteyê ne.

(1) *Zarokê porxelek pirtûka sor dixwîne.*


Risteya jorîn ji bêjeyên *zarok*, *porxelek*, *pirtûk*, *sor* û *xwandinê* pêk hatiye. Her risteya ku pêvebera wê têper e, ji xeynî pêkhêna lêkerî herî kêr xwedî biker, berkarekê ye. Di (1)ê da biker *zarokê porxelek*, berkar *pirtûka sor* e. Lewma em nikarin bêjin di (1)ê da biker bi serê xwe *zarok*, berkar jî *pirtûk* e. Ji ber vê me got bête pêkhênan risteyan bin jî pêkhênan rasterast ên risteyê ninin. Wekî xuya dike, pêkhênan rasterast ên risteyê frêz in.

Frêz di rêzimana nerîtî da ji bo "ravek"ê jî tê bikaranîn. Lê divê em diyar bikin ku frêz her carê bergenda "ravek" a di rêzimana nerîtî da nine. Wekî Akgül (2024, r. 4) jî diyar dike her ravek frêz be jî her frêz ne ravek e. Têgiha ravekê ji bo avahîyên bi îzafeyê (îzafe di rêzimana nerîtî ya kurmancî da wek *veqetandek* jî tê binavkirin) çêkirî tê bikaranîn ku herî kêr ji du bêjeyan pêk tê. Lê di frêzê da ne pêwîst e avahîya îzafeyê hebe.

Lewma frêz, wekî ravekan ne pêwîst e ji yekê zêdetir bêjeyan bigirin nava xwe. Wek mînak em dikarin li şûna risteya (1)ê risteya *Zarok pirtûkê dixwîneyê* jî çêkin ku biker û berkar bi rêzê frêzên *zarok* û *pirtûkê* ne û bi tenê ji bêjeyekê pêk hatine.

Her frêz xwedî *sereyekê* (head) ye. Sere taybetmendîya xwe dide hemû frêzê. Ji ber vê, her frêz li gor kategorîya ferhengî (lexical category) ya sereya xwe tê binavkirin. Bo mînak di frêza *zarokê porxelekê* da sere *zarok* e, kategorîya ferhengî ya *zarokê* navdêr (N) e, lewma jî frêza *zarokê porxelekê*, *frêzeka navdêrî* (noun phrase) (FN) ye. Hin cureyên din ên frêzan bi awayê *frêza lêkerî* (verb phrase) (FL), *frêza rengdêrî* (adjective phrase) (FR), *frêza hokerî* (adverbial phrase) (FH), *frêza (pêş)Daçekî* (prepositional phrase) (FD), *frêza îzafeyî* (FÎ) û hwd. in. Hin ji van binavkirinan dibe ku berevajî "ravek"ên di rêzimana nerîtî da xuya bikin. Di rêzimana nerîtî da wekî Akgül (2024, r. 4) jî diyar dike senifandina ravekan li gor ravekerê (modîfîyeker (modifier)) hatiye kirin, lê frêz li gor sereyê tîn binavkirin û senifandin. Bo mînak di rêzimana nerîtî da *zarokê porxelek* ji ber ku raveker (*porxelek*) rengdêrek e, ew wek "raveka rengdêrî", lê di warê frêzên da ji ber ku *zarok* sere û navdêr e, ew wek "frêza navdêrî" tê binavkirin û senifandin.


Frêz, qada herî mezin e ku sereyek taybetmendîyên xwe li wê dide der. Ev qada herî mezin wek *mezintirîn derdan* (maximal projection) tê binavkirin. Bo mînak FNya *zarokê porxelekê*, mezintirîn derdana NYa *zarokê* ye. Ev rewş dikare bi awayê jêrîn jî bê nîşandan. Di (2)yan da frêza Xê (FX) mezintirîn derdana sereya Xê ye.



*Binyada frêzî*, têkilîyên pêkhênan yekeyeka zimanî nîşan dide. Bi gotineka din binyada frêzî diyar dike ku di yekeyeka zimanî da kîjan hêman çawa li gel hevûdin yekeyeka mezintir çêdikin û di navbera wan da têkilîyeka çawa heye. Bo mînak me ji bo FNya *zarokê porxelekê* got ev frêz ji NYa *zarok* û R(engdêr)ya *porxelekê* pêk hatiye. Lê di rastîyê da di vê frêzê da hêmaneka din jî heye: îzafeya *eyê*. Nexwe ev frêz ji sê pêkhênan pêk tê ku dikare bi awayê jêrîn bê nîşandan.

(3) *zarokê porxelek* → *zarok* + *ê* + *porxelek*


Heman têkilîyê, em dikarin bi dardiyagramê jî nîşan bidin ku ev cure nîşandan binyada frêzî ya wê bi awayekî zelaltir nîşan dide.



Em dê binyada frêzî di çarçoveya *GB:BGyê* da pêşkêş bikin. Di *GB:BGyê* da teorîya ku binyada frêzan sererast dike teorîya *X-barê* ye (Chomsky, 2015, r. 48). Teorîya *X-barê* qebûl dike sê cure pêgirêdayîyên sereyekê hene: *nîşanker* (specifier), *temamker* (complement) û *zêdek* (adjunct). Chomsky (2015, r. 48) diyar dike ku teorîya *X-barê*, rêza di navbera sere û van her sê pêgirêdayîyan da diyar dike. Dîsa li gor teorîya *X-barê* riste jî tê da wekî Radford (1988, r. 547) jî wek mercek diyar dike, hemû temsîlên sîntaktîk (syntactic representation) navenavendî (endocentric) ne.

Di navbera sere û *temamkerê* (*tem*) da têkilîya *xwedîtiyê* heye yan jî ew pêgirêdayîya mecbûrî (obligatory) ya sereyê ye. *Nîşanker* (*nîş*), sereyê nîşan dikin, nasyarîya navdêran diyar dikin. Chomsky (1976, r. 52) dibêje *nîşanker* diyarker (determiner) in.

Ji alîyê din ve *zêdek*, derheqê sereyê da agahîyên *zêdetir* didin (wekî *cih*, *çavkanî*, *wesf* û *hwd.*). *Zêdek* hêmanên *xwestekî* (optional) ne. Anku hebûn an tunebûna wan li ser rêzimanîtiya (grammaticality) binyadeka zimanî bandorê çênake. *Nîşanker* û *temamker* li gor cureya frêzê dibe ku hêmanên mecbûrî yan jî *xwestekî* bin<sup>1</sup>. Her sê *nîşanker*, *temamker* û *zêdek* di dardiyagrama jêrîn da hatine nîşandan.



Her frêz *derdana* (projection) sereyekê ye. *Derdan* ew bendika hêmanan e ku kategorîya wê û sereya ku li vê bendikê serekî dike heman e (bo mînak *N*, *N'*, *N''*, *FN* û *hwd.*) (Carnie, 2013, r. 199). Di *derdana* sereyekê da, binyada hîyerarşik bi mînaka (5)an dikare wiha bê ravekirin: Ji alîyê hîyerarşik ve sere li asta sifirê ye (di (5)an da bi *Nyê* hatiye nîşandan ku di hin xebatan da bi awayê *N<sup>0</sup>*ê jî tê nîşandan). Dema *temamker* li sereyê *zêde* dibe frêz *gavek* berfireh dibe û asta *derdana navîn* (intermediate

<sup>1</sup> Sînorên di navbera *temamker* û *zêdekan* da *zêde* ne zelal in. Bi gotineka din, *temamker* bi qasî ku xuya dikin dibe ku hêmanên mecbûrî nebin û *zêdek* jî bi qasî ku xuya dikin dibe ku ne *xwestekî* bin. Anku hin hêmanên ku wek *zêdek* tên şîrovekirin dibe ku bi awayekî mecbûrî di risteyê da hebin. Ji bo agahîyên *zêdetir* bnr. Gündoğdu Yücel (2018, rr. 6-31).

projection) çêdibe (di (5)an da bi  $N'$ yê hatiye nîşandan). Dema zêdek li frêzê zêde bibe frêz berfireh bibe jî ev berfirehbûnê binyadî nine, lewma jî frêz dîsa li asta navîn ( $N'$ ) dimîne. Nîşanker ji herî der ve li frêzê zêde dibe û ji aliyê binyadî ve frêzê gaveka din berfireh dike ku *mezintirîn derdan* çêdibe (di (5)an da bi  $N''$ yê hatiye nîşandan). Ji ber ku zêdek di berfirehbûna frêzê da gaveka binyadî pêk nayîne, asta derdana navîn xwedî taybetmendîyeka xwedubareker (recursive) e. Ji ber vê, sereyek dikare bi awayekî bêdawî zêdekan werbigire. Bo mînak her carê bi lêzêdekirina zêdekekê ve bi rêzê frêzên wekî *pirtûka xwendekarî [ya sor]*, *pirtûka xwendekarî [ya sor] [a li ser maseyê]*, *pirtûka xwendekarî [ya sor] [a li ser maseyê] [ya li dibistanê]* dikarin bîn çêkirin ku ev binyad, ji aliyê teorîk ve dikare bi awayekî bêdawî bê domandin.


Têkiliyên binyadî yên di navbera sere, nîşanker, tamamker û zêdekê da bi têgehên merivatîyê dikarin bîn ravekirin: *Movika* (node) ku movikên din şax dide *movika dayik* (mother node), movikên ku ji heman *movika dayik* şax dane jî *movikên xwişk* (sister node) in. Di (5)an da ev têkilî dikarin bi awayê jêrîn bîn pênasekirin:

(6)

- (i) *Nîşanker* xwişka  $N'$ yê û keça  $N''$ yê ye
- (ii) *Zêdek* hem xwişk hem jî keça  $N'$ yê ye
- (iii) *Temamker* xwişka  $N'yê$  û keça  $N''$ yê ye

Di zimanan da sere dikare li pêş an jî li paş tamamker, nîşanker û zêdekên xwe cih bigire. Ziman ji vî aliyê ve bi giştî du kom in: *sere-pêş* (head-first) (wekî di *FDya li malêyê* da) û *sere-paş* (head-last) (wekî di *FLya pirtûk xwendê* da). Ev her du, bi rêzê wek *sere-çep* (head-left) û *sere-rast* (head-right) jî tîn binavkirin. Di lîteraturê da bi giştî ziman di bin van her du koman da hatibin dabeşkirin jî, zimanên ku her du taybetmenîyan jî nîşan didin hene. Wekî Gündoğdu (2011, rr. 38-39) jî dibêje kurmancî hem taybetmendîyên bêjêrêzîya sere-çep hem jî yên sere-rast nîşan dide û di kurmancî da di frêza *bazinedaçekî* (circumposition) da tamamker di navberê da dimîne.

Li jor me nîşan da ku diyarker, li pozîsyona nîşankerî ya  $FN$ yê cih digirin û diyarker li jor wek pêgirêdayî hatin şîrovekirin, lê pêgirêdayî frêzî ne. Wekî Cook û Newson (2007, r. 105) dibêjin diyarker ne frêzî, lê bêje ne. Cara pêşîn Abney (bnr. 1987, rr. 265-297) li gor hin çavdêrîyên zimanî pêşniyaz kiriye ku di bingeha xwe da diyarker sereyên kargînî/erkî ne<sup>2</sup> û  $FN$  jî wek tamamkera diyarkerê qebûl kiriye. Ev pêşniyaz bi awayekî giştî hatiye qebûlkirin. Em dê jî ji vê şûn da  $FN$ yan wek tamamkerên diyarkeran nîşan bidin. Bi vî rengî di binyada frêzî da pozîsyonên ku heta niha ji aliyê  $FN$ yan ve dihatin dagirtin, ji vê şûn da dê ji aliyê frêzên diyarkerî ( $FDI$ ) ve bîn dagirtin, lê  $FN$  dîsa wekî her frêzê xwedî binyadê hîyerarşik a hundirîn e. Binyada  $FDI$ yê bi awayê jêrîn e.



<sup>2</sup> Ji aliyê kategorîyên xwe ve sere dikarin di bin du cureyan da bîn komkirin: *Kategorîyên ferhengî* (lexical category) û *kategorîyên kargînî* (functional categories). Kategorîyên ferhengî li ser diyarkirina naveroka risteyê xwedî rol in, lê kategorîyên kargînî li ser diyarkirina naveroka risteyê xwedî rolekê ninin. (Haegeman û Guéron, 1999, r. 138). Kategorîyên wekî navdêr, lêker, rengdêr ji ber ku li ser wateyê bandorê çêdikin, wek sereyên ferhengî kar dikin. Ji aliyê din ve, wekî em dê bibînin, sereyên wekî *DEM*, *TEM* ji ber ku li ser wateyê bandorekê çênakin wek sereyên kargînî kar dikin. Ji vî aliyê ve derdanên sereyên ferhengî *derdanên ferhengî* (lexical projections) yên sereyên kargînî jî *derdanên kargînî* (functional projections) ne (Haegeman, 1998, r. 116).

Pozîsyonên nîşanker û tamamkerî li gor cureya frêzê dibe ku dagirtî yan jî vala bin. Li gel vê, di hin cure frêzan da sere jî her carê ne mecbûrî ye pêk bê. Lê ji ber ku sere rêvebir e, pozîsyona sereyê vala be jî, dê di dardiyagraman da bê nîşandan. Lê heta pozîsyonên nîşanker û tamamkerî yên frêzê dagirtî yan jî kargîni nebin ew dê ji bo sadekirina dardiyagraman, neyên nîşandan.

Niha jî em vegeerîna tîgeha *çarçoveya binkategorîzasyonê*. Her lêker di binyada frêzî da hewcedarî bi hin kategorîyên din heye. Bo mînak lêkerekê *xwendinê* hewcedarî bi tamamkerê heye ku kategorîya wê *FDIyek* e. Ev rewş wek *çarçoveya binkategorîzasyonê* tê zanîn. *Çarçoveya binkategorîzasyonê* diyar dibe ku kategorîyek di binyadê sîntaktîk da li gel kîjan kategorîyan xuya dibe (Horrocks, 2013, r. 34). *Çarçoveya binkategorîzasyonê* wiha tê nîşandan:

(8)

(i) *xwendin*: [FDI \_ ]

(ii) *kenîn*: [ \_ ]

(iii) *dan*: [FDI \_ FD]

(8i), nîşan dide ku di binyadê sîntaktîk da li aliyê çepê yê lêkera *xwendinê* divê *FDIyek* hebe, (8ii) jî nîşan dide li aliyê rast an jî çepê yê lêkera *kenînê* divê frêzek tune be. Di (8iii)yan da tê nîşandan ku di binyadê sîntaktîk da lêkera *danê* divê di navbera *FDI* û *FDyekê* da cih bigire<sup>3</sup>. *Çarçoveyên binkategorîzasyonê* yên di (8)an da di heman demê da diyar dikin ku kîjan cure frêz ji sereya frêzê şax dide/didin. Bo mînak *xwendin FDIyekê* şax dide, *kenîn* frêzekê şax nade, *dan FDIyek* û *FDyekê* şax dide.

Eger bal kişandibe biker di *çarçoveya binkategorîzasyonê* da cih nagire. Lewra ji ber ku di *BGYê* da prensîpeka bi navê *Prensîpa Derdanê ya Berfirehkirî (PDB)* di her risteyê da hebûna bikerekê pêwîst dibe (bnr. Carnie, 2013, r. 238), Chomsky (1988, r. 26) dibêje lêker bikeran binkategorîze nakin. Lewma jî di *çarçoveya binkategorîzasyonê* da *FDIya* bikerî cih nagire.

Di vê xebatê da em dê li ser lêkerên têper ên kurmançî û yên zazakî kar bikin. Di rêzimana nerîfî da ji aliyê binyadî ve lêker bi awayekî giştî di bin sê koman da tên senifandin: *lêkerên sade*, *lêkerên dariştî* û *lêkerên lêkdayî/hevedudanî*. Di hin xebatên zimannasîyê da hin lêkerên dariştî û hemû lêkerên lêkdayî di bin navê *pêveberên kompleks* (complex predicates) (*PK*) da tên senifandin û her çiqas *PK* hêmanên lêkerî bin jî ew ji hin alîyan ve ji lêkerên sade tên cudakirin. Di xebata me da sedema cudakirineka wekî "lêker" û "pêveberên kompleks"ê ew e ku lêker hêmanên ferhengî ne, lê derheqê rewşa ferhengîtiya pêveberên kompleks da lihevkirineka giştî tune ye. Li gor hin kesan, ew hêmanên ferhengî ne (bo mînak bnr. Goldberg, 1996, r. 133, 144; Dabir-Moghaddam, 1997, rr. 25-26) û li gor hin kesên din ew bi prosesê sîntaktîk pêk tên (bo mînak bnr. Baker, 1988; Megerdoomian, 2001, r. 98; Gündoğdu, 2015). Di xebatên rêzimana nerîfî ya kurmançî da hin cure *PK* wek lêkerên "dariştî" (wekî *ra-kirin*, *ve-xwarin*) (bnr. Bakır, 2020, rr. 172-175), hinek wek "lêkerên lêkdayî" (wekî *sor kirin*, *sond xwarin*) (bnr. Baran, 2018, rr. 179-181) û hinekên din jî yek caran wek "lêkerên biwêjî" (wekî *dev jê berdan*) (bnr. Baran, 2018, r. 184; Bakır, 2020, r. 182) (an jî "lêkerên bi daçek" (wekî *lê dan*) (bnr. Tan, 2015, rr. 265-267) hatine senifandin. Nîqaşên di warê ferhengîtiyê û sîntaktîkîya *PKyan* da kirin ku em *PKyan* li derveyê sînoren xebatê bihêlin.

## Teorîya ROLÊ

Teorîya ROLÊ, li ser tîkîlyên taybetmendîyên semantîk û sîntaktîk ên hêmanên ferhengî kar dibe. Ji aliyê lêkerê ve li argumentan lêbarkirina taybetmendîyên semantîk wek ROL<sup>4</sup> tê binavkirin (Chomsky, 1986, r. 93). Ji vî aliyê ve ROL amaje bi *tîkîlyên tematîk* (thematic relations) ên hêmanên

<sup>3</sup> Di risteyên wekî *Azadî pirtûk da Dîlanê* da piştî lêkera *danê Dîlan* wek *FDIyek* xuya dibe lê me frêza piştî lêkera *danê* wek *FD* nîşan da. Sedemên vê rewşê em dê piştre rave bikin.

<sup>4</sup> ROL, wek ROLên tematîk (theta role) an jî  $\Theta$ -ROL ( $\Theta$ -role) jî tê binavkirin

ferhengî yê xwedî naverokeka semantîk û argumentên wê dike. Bi gotineka din, hêmanên ferhengî yê xwedî naverokeka semantîk, li argumentên xwe ROLan bar dikan. Lewma her cure sere (bo mînak sereyên kargînî) nikare ROLan bar bike. Bo mînak lêkera *xwendinê* (zz. *wendene*) xwedî naverokeka semantîk e û du argumentên wê hene, ew li argumenta li pozîsyona bikerî ROLA Ê/A *DIXWÎNE/XWENDÊ* (zz. *O/A KE WANENO/A/ WEND*), li argumenta li pozîsyona berkarî jî ROLA Ê/A *KU TÊ/HAT XWENDINÊ* (zz. *O/A KE YENO/A/ AMO/A WENDENE*) bar dike. Lewma her yek ji argumentên lêkera *xwendinê* li gel wê xwedî têkilîyeka cuda ye. Ya yekem li pozîsyona bikerî cih digire û karê *xwendinê* pêk tîne û ya duyem li pozîsyona berkarî cih digire û tiştê ku dikeve ber karê *xwendinê* nîşan dide.

ROL li k-binyadê (d-structure) tîr barkirin û li r-binyadê (s-structure) tîr parastin. K-binyad û r-binyad du temsîlên astên sîntaktîk in di *BGYê* da û Chomsky (1988, r. 5) diyar dike ku tiştê ku van her du astan yeksan (mapped) dike *a-cihguherîn* (move- $\alpha$ ) ye. Bi gotina Chomskyî (1982, r. 15) ve *a-cihguherîn* bi kurtasî dibêje "kategorîyêkê cih biguhere bo cihekî". Li jêr em dê bi binyada frêzî ya risteyê ve bi kurtasî k-binyad û r-binyadê bidin nasîn.


Me li jor got hemû temsîlên sîntaktîk navenavendî ne ku riste jî temsîleka sîntaktîk e, lewma jî xwedî sereyekê ye. Chomsky (1986, rr. 160-161; 1988, r. 52) diyar dike ku di risteyekê da sereyeka bi navê *DEM*<sup>5</sup> heye ku *DEM* an demdar (finite) (xwedî taybetmendîya [+dem]ê ye) an jî nedemdar (infinite) (xwedî taybetmendîya [-dem]ê ye) e. Derdana navîn a *DEM*'ê ji *DEMa* sere û *FLya* temamkera wê pêk tê. *DEM*'a (*FDEM*) mezintirîn derdan bixwe wek temamkera sereyeka bi navê *TEM*(amker) (*COMP*(lementizer)) di risteyê da bi cih dibe.

Bikera *FDEMê* (anku bikera risteyê) li k-binyadê li pozîsyona nîşankerî ya *FLyê* cih digire, lê li r-binyadê cih diguhere bo pozîsyona nîşankerî ya *FDEMê* ([*nîş*, *FDEM*]). Di bin *DEMê* da li k-binyadê hêmanên wekî *Dem*, *Rawe* û *Kesê* cih digirin. Ev hêman li r-binyadê eger hewce be cih diguherin bo pozîsyonên xwe yê li r-binyadê yan jî lêker dikare cih biguhere û bi wan ve bizeliqe. Bo mînak di risteya jêrîn da hêmana demê (*dê/zz. do*) ya *Demê* dê li pozîsyona xwe bimîne, hêmana *Raweyê* (*bi-*) cih biguhere pêşîya lêkerê û ya *Kesê* (*-e/zz. -o*) bar bike piştî lêkerê yan jî lêker dê pêşî dikare bar bike û bi *-eyê* ve bizeliqe û piştê *xwîne* cih biguhere û bi *biyê* ve bizeliqe ku dê *bixwîne* pêk bê. Li jêr di (9)an da k-binyada *FDEMa* *Dîlan dê pirtûkê bixwîneyê* (zz. *Dîlane do kitabî biwano*) hatiye nîşandan<sup>6</sup>.

<sup>5</sup> Berîya qebûlkirina *DEMê*, hatiye qebûlkin ku sereya risteyê *K*(êş) (*INFL*(ection)) e. Anku her riste wek derdaneke *Kyê* hatiye qebûlkin lewma jî riste wek frêza kêşî (*FK*) hatiye qebûlkin. Di bin *FKyê* da frêzên din ên wekî *rawe* (mood), *xuyang* (aspect), *dem* (tense), *rêkeftin* (agreement), *jimar* (count), *pirsyarî* (interrogation) hatine bicihkirin, lê piştî demekê ev boçûn hatiye terikandin û hatiye qebûlkin ku sereya risteyê *DEM* e. Lewma di hin xebatên berîya qebûlkirina *DEMê* da, li gor boçûna berê sereya risteyê wek *K* hatiye nîşandan. Di vê xebatê da dema amaje bi wan xebatan bê kirin li şûna *Kya* wan, dê *DEM* bê bikaranîn.


<sup>6</sup> Di dardiyagrama (9)an da di bin movika *DEMê* bicihkirina hêmanên *Dem*, *Rawe* û *Kesê* li gel taybetmendîya *du-şaxî* (binary branching) ya *X*-barê li hev nake. Lewra li gor vê taybetmendîyê her movik dikare herî zêde li ser du movikan şax bide. Lê di mînakê da *DEMê* li ser sê movikan şax daye. Ev kêşe dikare bê sererastkirin, lê ji ber ku rasterast têkildar nine bi mijara me, em vê kêşeyê li ber çavan nagirin.

(9)



Di xebatê da, ji bo hêsanîyê em dê cihguherîna hêmanên *DEM*ê (yan jî lêkerê) nîşan nedin û wan, li k-binyadê li cihê cihguherî yê li r-binyadê nîşan bidin. Piştî cihguherînan r-binyada *FDEM*ê wekî mînakê di (10)an da xuya dike, pêk tê. Dardiyagrama jêrîn nîşan dide ku *Dilane* wek bikerek li r-binyadê ji pozîsyona nîşankerî ya *FLy*ê cihguherîye bo pozîsyona nîşankerî ya *FDEM*ê<sup>7</sup>.


(10)



Me li jor got *FDEM* wekî tamamkerê *TEM*ê pêk tê. Anku her *FDEM* di nav *FTEM*ê da pêk tê. Di vê çarçoveyê da Chomsky (2015, r. 49) dibêje risteyekê tamam ji aliyê *TEM*ê ve tê birêvebirin, lewma jî *FTEM*ê e. *TEM* di kurmancî da bi piranî bi hêmanên wekî *ku*, *da*, *da ku*, *gelo*, *ji boyê* pêk tê. Di zazakî da jî bi hêmanên wekî *ke* ('ku'), *gelo* ('gelo'), *seba* ('seba/ji bo') tên bikaranîn. Di kurmancî û


<sup>7</sup> Li k-binyadê sedema bicihkirina bikerê ya li pozîsyona nîşankerî ya *FLy*ê ji ber *birêvebirinê* (government) pêk tê. Birêvebirinê têkilîyeka sintaktîk e di navbera sere û pêgirêdayîyên wê da (bnr. Haegeman, 1998, r. 137). Lêbarkirina ROLan di çarçoveya birêvebirinê da pêk tê. Eger li k-binyadê biker li pozîsyona nîşankerî ya *FDEM*ê (pozîsyona bikerê ya li r-binyadê ya di dardiyagrama (10)an da) bê bicihkirin, lêkerê dê nikaribe bikerê bi rê ve bibe. Ji ber vê jî dê nikaribe li wê ROLê bar bike. Bicihkirina bikerê li pozîsyona nîşankerî ya *FLy*ê bi hîpotezeka bi navê *Bikera di Hundirê FLyê dayê* (subject-in-VP hypothesis) hatiye pêşkêşkirin. Wekî Chomsky (2015, rr. 54-55) nîşan dide bi saya vê hîpotezê kêşeya birêvebirinê ji holê radibe û lêker dikare li bikerê ROLê bar bike.

zazakî da *TEM* dikare bi awayekî vekirî pêk bê yan jî vala be. Ev, li gor cureya *TEMê* diguhere. Bo mînak dema *TEM ku* be, dikare neyê bikaranîn, lê dema *TEM gelo* be, tunebûna wê nebe sedema nerêzimanîyê jî, ew gelek caran bi awayekî aşkere pêk tê. Binyada giştî ya *FTEMê* wiha ye: (ji ber ku *DEM''* li jor bi awayekî vekirî hatiye nîşandan li jêr ew bi awayekî ne-vekirî hatiye nîşandan).



Me got *ROL* li k-binyadê tên barkirin. Chomsky (1986, r. 155) diyar dike ku k-binyad temsîla saf (pure) a binyada *ROLê* ( $\Theta$ -structure) ye: Her argument li *ROL*-pozîsyonekê (role-position) bi cih dibe û her *ROL*-pozîsyon ji alîyê argumentekê ve tê dagirtin ku li vê derê argument frêzek e û divê li wê *ROL* bê barkirin. Wekî me gotibû *ROL* li k-binyadê tên barkirin, li r-binyadê tên parastin. Bo mînak *FDIyekê* li k-binyadê kîjan *ROL* wergirtibe, li r-binyadê jî heman *ROLê* diparêze.

Lêker ji ber ku *ROLan* bar dikin *ROL-barker* (ROLE assigner) û argumentên wê jî ji ber ku *ROLan* werdigirin *ROL wergir* (ROLE assignee) in. Lêker li argumentên xwe *ROLên* wekî *KARA* (AGENT), *MIJAR* (THEME), *CIH* (LOCATION) û hwd. bar dikin. Li jêr di dardiyagramê da *ROLên* ku lêkera *xwendinê* (zz. *wendene*) li argumentên xwe bar dike, xuya dikin.



Di risteyekê da her argumentek bi tenê dikare yek *ROLê* werbigire û her *ROL* bi tenê dikare li yek argumentê bê barkirin. Ev wek *pîvera ROLê* (ROLE criterion) tê zanîn (bnr. Chomsky, 1988, r. 36).

Wekî li jor tê dîtin di navbera pozîsyonên sîntaktîk û lêbarkirina *ROLan* da têkilîyek heye. Pozîsyonên sîntaktîk ên argumentên sereyekê *binyada argumentî* (argument structure) ya wê diyar dikin. Di çarçoveya vê binyada argumentî da ji bo her sereya ku dikare *ROLê* bar bike, *binyadeka ROLê* jî çêdibe. Li jêr bi rêzê em dê li ser van binyadan rawestin.

*Binyada argumentî* amaje bi hejmara argumentên ku lêker hewcedarî pê heye, dike. Li vê derê argument beşdarên (participant) çalakîya di lêkerê da ne. Ji alîyê din ve Haegeman (1998, r. 44) diyar dike ku binyada argumentî nîşan dide kîjan hêmanên risteyê mecbûrî ne. Lewma jî hêmanên ku ne mecbûrî ne (wekî zêdekan) di nav binyada argumentî ya lêkerê da cih nagirin. Lewra wekî Carnie (2013,

r. 57, 58) diyar dike mebest ji argumentê, bi tenê *hêmanên mecbûrî* (obligatory elements) ne. Binyada argumentî<sup>8</sup> wiha tê nîşandan:

(13)			
(i) <i>xwendin/zz. wendene:L</i>	1	2	
	<i>FDI</i>	<i>FDI</i>	
(ii) <i>kenîn/zz. huyayene:L</i>	1		
	<i>FDI</i>		

Di (13)an da *FDIyên rêza 1ê*, pozîsyona bikerî û di (13i)ê da *FDIya di rêza 2yan* da jî pozîsyona berkarî nîşan dide.

Ji alîyê din ve *Binyada ROLî* nîşan dide ku lêker kîjan ROLan li argumentên xwe bar dike.

(14)			
(i) <i>xwendin/zz. wendene:L</i>	1	2	
	<i>FDI</i>	<i>FDI</i>	
	<i>KARA</i>	<i>MIJAR</i>	
(ii) <i>kenîn/zz. huyayene:L</i>	1		
	<i>FDI</i>		
	<i>KARA</i>		

(14)an em dikarin wiha bixwînin: Lêkera *xwendinê* xwedî du argumentan e. Lêker ji bo van argumentan di binyada sîntaktîk da xwedî du pozîsyonan e. Argumentên ku van pozîsyonan dadigirin divê kategorîyên *FDIyî* bin. Lêkera *xwendinê* dê li argumentên ku li van pozîsyonan bi cih dibin ROLên semantîk bar bike. Ev ROL, ji bo ya di rêza 1ê da ROLA KARAYê û ji bo ya di rêza 2yan da jî ROLA MIJARê ye. Bi heman awayî lêkera *kenînê* xwedî yek argumenta *FDIyî* ye. Lêker li vê tekane argumenta xwe ROLA KARAYê bar dike.

Lêkerên cuda dikarin heman ROLan bar bikin. Bo mînak hem lêkera *xwendinê* hem jî lêkera *kenînê* li bikera xwe ROLA KARAYê bar dikin. Ji ber vê, hejmara ROLan diyar e û lêker ji vê listeya ROLan, ên têkildar in bi wateya wan, li kategorîyên din bar dikin.

Lêkerên kurmancî û yên zazakî sê cure temamkeran binkategorîze dikin: *FDI*, *FD* û *FTEM*. Hin lêker dikarin ji yekê zêdetir temamkeran wek alternatîf binkategorîze bikin. Bo mînak lêkera *dîtinê* (*zz. dîyene*) hem dikare *FDIyekê* hem jî *FTEMekê* binkategorîze bike ku em dê li jêr mînakên wan bibînin.

### **Binyada ROLî di Lêkerên Têper ên Kurmancî û yên Zazakî da**

Di kurmancî û zazakî da lêker ji alîyê hejmara ROLên ku bar dikin, dibin sê kom: *Lêkerên yek-ROLî*, *lêkerên du-ROLî* û *lêkerên sê-ROLî*. Wekî navên wan jî amaje pê dikin, lêkerên yek-ROLî bi tenê yek ROLê, yên du-ROLî du heb ROLan û yên sê-ROLî jî sê ROLan bar dikin. Lêkerên yek-ROLî di nêzîkahîya rêzimana nerîfî da lêkerên teneper û formên tebatî yên lêkerên du-ROLî digirin nava xwe. Em dê wan li derveyî nîqaşê bihêlin û bi tenê li ser lêkerên têper rawestînin ku du-ROLî yan jî sê-ROLî ne. Hin lêkerên ku hejmara ROLên wan yek e, ji alîyê cureya kategorîyên ku binkategorîze dikin cudahîyê nîşan didin. Li jêr em dê lêkerên têper li gor hejmara ROLan û cureya argumentên ku binkategorîze dikin vekolin. Ji ber ku ROL li k-binyadê tîr barkirin, di binbeşên jêrîn da heta ne hewce be em dê bi tenê k-binyada *FLyan* nîşan bidin.


<sup>8</sup> Li gel lêkeran, kategorîyên din ên wekî rengdêr, navdêr, daçek jî xwedî binyada argumentî ne (bnr. Haegeman, 1998, rr. 46-48), lê ji ber ku mijara me ya sereke tîrildar e bi lêkeran em dê li ser binyada argumentî ya kategorîyên ji bilî lêkeran ranwestînin.

### Lêkerên du-ROLî

Lêkerên du-ROLî yekê ji ROLên xwe, li argumenta bikerî ya din jî li argumenta xwe ya tamamkerî bar dikin. Kategorîya tamamkerê dibe ku *FDIyek*, *FDyek* an jî *FTEMek* be. Di vê beşê da em dê van lêkeran li gor cureya kategorîya tamamkera ku ew binkategorîze dikin vekolin.

### Lêkerên du-ROLî yên ku *FDIyekê* Binkategorîze Dikin

Ev lêker ji wê koma lêkeran pêk tên ku li pozîsyona xwe ya tamamkerî *FDIyekê* binkategorîze dikin û li wê ROLê bar dikin. Hin ji van lêkeran ev in: *xwendin* (zz. *wendene*), *nivîsîn* (zz. *nuştene*), *xwarin* (zz. *werdene*). K-binyada giştî ya *FLya* van lêkeran bi mînak *Dîlanê pirtûk xwendê* (zz. *Dîlane kitab wend*) li jêr hatiye nîşandan (Di mînakên da heta cudahî tune bin, bergendên zazakî yên ji bo mînakên kurmancî dê li bin an jî nik ên kurmancî bîn bicihkirin).



### Lêkerên du-ROLî yên ku *FDI* yan jî *FTEMekê* Binkategorîze Dikin

Ev cure lêker dikarin hem *FDIyek* hem jî *FTEMekê* wek alternatîf binkategorîze bikin. Bülbül (2019) ji bo lêkerên ku dikarin wek tamamker *FTEMekê* (di xebata wî da *hevoka tamamker*) binkategorîze bikin dibêje, *FTEM* bi awayekî semantîk di rola bireserê (berkar) da ne<sup>9</sup>. Li jêr em dê nîşan bidin ku ev *FTEM* çawa û li gor çî ji aliyê semantîk û sîntaktîk ve wek berkar tên şirovekirin. Dîsa wekî Yonat û Aslanoglu jî diyar dikin, di kurmancî da, lêkerên *FTEMan* (di xebata wan da *binhevok*) wekî lêkerên risteyên bingehîn tên kişandin (2023, r. 22). Ev jî tê wê wateyê ku *FTEM* di nav xwe da ji aliyê sîntaktîk ve risteyên serbixwe ne. Mînakên van cure lêkeran *gotin* (zz. *vatene*), *dîtin* (zz. *diyene*), *xwestin* (zz. *waştene*), *kirin* (zz. *kerdene*), *pîrsîn* (zz. *persayene*), *bihîstin* (zz. *eşnawitene*) in.

(16)

(i) *Dîlanê* [*FDI pirtûk*] *dît* / zz. *Dîlane* [*FDI kitab*] *dî*

(ii) *Dîlanê dît* [*FTEM ku xwendekar pirtûkê dixwînin*] / zz. *Dîlane dî* [*FTEM ke wendekarî kitabî wananê*]

Ji bo ku em bikaribin diyar bikin lêkerek bi rastî jî dikare ji yekê zêdetir kategorîyan binkategorîze bike yan na, çend tişt hene ku em dikarin lê binihêrin. Berîya her tiştî wek testek em dikarin li vê binihêrin: Eger lêkerek bikaribe wek alternatîf ji yekê zêdetir kategorîyan binkategorîze bike, divê hebûna yekê û tunebûna ya din binyadê nerêzimanî neke. Wekî li jor tê dîtin di (16i)ê da hebûna *FDIya pirtûkê* (zz. *kitab*) û tunebûna *FTEMa* di (16ii)yan da, û di (16ii)yan da jî hebûna *FTEMa ku xwendekar pirtûkê dixwîninê* (zz. *ke wendekarî kitabî wananê*) û tunebûna *FDIya pirtûkê* ya di (16i)ê da binyadê nerêzimanî nake. Lewma diyar dibe ku ew heman peywirê di risteyê da bi cih fînin. Berevajî lêkera *dîtinê*, em li mînakên lêkera *xwendinê* (zz. *wendene*) binihêrin.

(17)

<sup>9</sup> Ji bo xebateka berfireh a lêker û *PKyên* kurmancî (yên devoka Torî) ku wek tamamker *FTEMê* werdigirin bnr. Gültekin (2019).

(i) *Dîlanê* [*FDI pirtûk*] *xwend* / *ZZ. Dîlane* [*FDI kitab*] *wend*

(ii) \**Dîlanê*  $\xi_i$  *xwend* [*FTEM ku tiştan hîn bibe*]<sub>i</sub> / \**Dîlane*  $\xi_i$  *wend* [*FTEM ke çîyan bimusa*]<sub>i</sub>

Di (17i)ê da *xwendinê FDIya pirtûkê* binkategorîze kiriye û li wê ROL bar kiriye ku riste rêzimanî ye. Di (17i)ê da *pirtûk* wek berkara pêveberê tê şîrovekirin ku ji bo lêkera *xwendinê* hebûna *FDIyeka* temamkerî mecbûrîyek e.

Di (17ii)yan da hevîndeksîya (*i,i*)yê ya  $\xi$  û *FTEMê* diyar dike ku *FTEM* li k-binyadê li pozîsyona temamkerî hatiye hilberîn û li r-binyadê wê cih guherîye bo pozîsyona piştî lêkerê. Eger em bi awayekî din bêjin, ev hevîndeksî tê wê wateyê ku *FTEMa* di (17ii)yan da, li pozîsyona *pirtûka* di (17i)ê da hatiye hilberîn. Eger ev rast be, nexwe divê ev *FTEM* jî wek berkara pêveberê bê şîrovekirin (wekî di mînaka (16ii)yan da). Dema ew wek berkar bê şîrovekirin jî divê *FTEMa* di (17ii)yan da bersiva pirsê "Dîlanê çi xwend?"ê (ZZ. "Dîlane çiçî wend?") be. Ji ber ku bersiva vê pirsê ne "\*Dîlanê xwend ku tiştan hîn bibe" (ZZ. \**Dîlane wend ke çîyan bimusa*) ye, diyar dibe ku *FTEMa* di (17ii)yan da, ne berkara pêveberê ye lewma jî em nikarin bêjin ew temamkera pêveberê ye. Ji ber vê jî dema ew wek berkar bê şîrovekirin wekî di (17ii)yan da xuya dike nerêzimanî pêk tê.

Testeka din jî ew e ku gelo em dikarin her du kategorîyan bi carê di risteyê da bi cih bikin an na. Eger bi hebûna her du kategorîyan riste nerêzimanî bibe nexwe lêker dikare wan her duyan wek alternatîf binkategorîze bike. Lewra eger lêkerê dikare du heb kategorîyan wek alternatîf binkategorîze bike, bi tenê yek ji wan dikare di risteyê da cih bigire. Eger hebûna her du kategorîyan binyadê nerêzimanî neke nexwe yek ji wan temamker, a din zêdek e.

(18) *Dîlanê* [*FDI pirtûk*] *xwend* [*FTEM ku tiştan hîn bibe*] / *ZZ. Dîlane* [*FDI kitab*] *wend* [*FTEM ke çîyan bimusa*]

Di (18)an da bi awayekî zelal xuya dike ku hem *FDI* hem jî *FTEM* dikare di heman risteyê da cih bigire. Me li jor bi mînakên (17)an nîşan da ku *xwendin FDIyê* binkategorîze dike. Lewma jî em digihêjin wê encamê ku *FTEMa* di (18)an da, ne temamker, zêdek e. Niha jî em binihêrin di heman risteyê da hebûna her du temamkerên alternatîf binyadê çawa nerêzimanî dike.

(19) \**Dîlanê* [*FDI xwendekar*] *dît(-in)* [*FTEM ku xwendekar pirtûkê dixwînin*] / *ZZ. \*Dîlane* [*FDI wendkar-î*] *vîna-(y)î* [*FTEM ke wendekarî kitabî wanênê*]

Nerêzimanîya (19)an nîşan dide ku hem *FDI* hem jî *FTEM* temamker in û nabe her du di heman risteyê da cih bigirin. Sedema nerêzimanîyê, têkildar e bi binyada ROLî ya lêkera *dîtînê*. Lêkera *dîtînê* du heb ROLan bar dike. Yekê ji van li *FDIya bikerî (Dîlan)* bar dike ya din jî li temamkera din. Lewma jî li holê temamkerê bê ROL dimîne. Dema di binyadê da hêmanek bê ROL bimîne ev rewş dibe sedema binpêkirina pîvera ROLê, ji ber vê jî (19) wek nerêzimanî tê kodkirin.

### Lêkerên Du-Rolî yên ku FDyekê Binkategorîze Dikin

Ev cure lêker li pozîsyona xwe ya temamkerî *FDyekê* binkategorîze dikin. Bi gotineka din ev *FD* berkara van cure pêveberan e. Lewra wekî İncekan (2014, r. 15) jî diyar dike di kurancî da lêkerên ku berkara wan bi awayekî nerastereast pêk tê, berkarên xwe bi saya daçekê werdigirin. Heman tişt ji bo zazakî jî derbasdar e.

Me got lêker li argumentên xwe ROLan bar dikin. Lê ya rasttir lêker li beşdarên ku tev li karên wan dibin, ROLan bar dikin. Gelek caran beşdarên lêkeran wek argument pêk tên, lê yek caran argument rasterast ne beşdara çalakîya di lêkerê da ye. Dema argument kategorîyeka ROL-wergir be, wê demê rasterast li argumentê ROL tê barkirin, lê dema argument ne cureyeka ROL-wergir be wê demê ROL ne li argumentê li hêmana ku di nav wê da cih digire û beşdarî karê lêkerê dibe, tê barkirin. Bo mînak di kurancî da lêkera *nihêrînê* wek temamker *FDyekê* werdigire. Wekî *Dîlanê li pirtûkê nihêrî*. Lêkera *nihêrînê* du heb ROLan bar dike. Em vê ji ber hejmarê argumentên wê dizanin. Yekê li *FDIya bikerî* bar dike, argumenta din jî *FD* ye, lê Stowell (1981, r. 383) diyar dike ku ROL rasterast li *FDyan* nayê

barkirin. ROL bi awayekî têkelî li asta *forma mantiqî* (logical form)<sup>10</sup> li berkara pêşdaçekê tê barkirin<sup>11</sup>. Li vir mebest ji berkara pêşdaçekê, tamamera pêşdaçekê ye. Bo mînak di *FDya li pirtûkê* da berkara pêşdaçekê *FDIya pirtûkê* ye. Li gor vê, di risteya *Dîlanê li pirtûkê nihêrîyê* da lêkera *niherînê* li *Dîlanê* ROLê bar dike, lê ROLa *pirtûkê* ji aliyê têkelîya *li+niherînê* tê barkirin.

Lêkerên ku *FDyekê* binkategorîze dikin di kurmancî û zazakî da ne berbelav in. Hin ji mînakên van cure lêkeran *niherîn* (zz. *ewnîyayene*), *lîstin*<sup>12</sup> in.

(20)

(i) *Dîlanê* [<sub>FD</sub> *li pirtûkê*] *niherî* / zz. *Dîlane* [<sub>FD</sub> *kitabî ra*] *ewnîya*

(ii) *Dîlanê* [<sub>FD</sub> *lê*] *niherî* / zz. *Dîlane* *ci ra ewnîya*

Di (20i)ê da argumenta tamamkerî ya lêkera *niherînê* wek *FDya li pirtûkê* (zz. *kitabî ra*) pêk hatiye. Lêkera *niherînê* bi tekarîya pêşdaçeka *liyê* (zz. *ra*) li *FDIya pirtûkê* (zz. *kitab*) ROLa HEDEFÊ bar dike. Di (20ii)yan da argumenta tamamkerî wek *FDya lêyê* (zz. *ci ra*) pêk hatiye. Di kurmancî da hemanên wekî *jê*, *lê*, *pê* û *têyê* ji pêşdaçekê û cihnavên nîşanî (*vî/vê*, *wî/wê*) an jî cihnavên kesê/a sêyem ê/a yekjimar (*wî/wê*) pêk tên (Farqînî, 2019, r. 50). Bo mînak *lê* ji daçeka *liyê* û yek ji van cihnavan pêk tê (wekî *li+wê* → *lê*). Di xebatên rêziman û zimannasîya zazakî da *ci* (bi heman awayî *pi*, *ti*) gelek caran wek cihnav (tewandî) kesê/a sêyemîn ê/a yekjimar hatiye qebûl kirin (bnr. Todd, 2008, r. 47; Werner, 2012; Demîr, 2015, r. 42; Arslan, 2018, r. 12; Baluken, 2019, r. 51; Kırkan, 2021, r. 62). Em li mînaka jêrîn binihêrin.

(21)

(i) *Mi ci ra pers kerd* 'Min ji *wî/wê* pirs kir'

(ii) *Mi aye ra pers kerd* 'Min ji *wê* pirs kir'

Di (21ii)yan da li şûna *ciya* di (21i)ê da, cihnav tewandî ya kesa sêyemîn a yekhejmar (*aye* ('wê')) hatiye bicihkirin. Bi heman awayî wekî di (20ii)yan da xuya dike *ciyê* şûna *FDIya kitabî* ya di (20i)ê da wergirtiye. Cardin bo mînak di avahîyên wekî *nameyê ciyê*<sup>13</sup> da li şûna *ciyê* rasterast forma tewandî ya cihnav kesê/a sêyemîn ê/a yekjimar dikare bê bicihkirin: wekî *nameyê ey/aye* ('navê wî/wê') Ji ber çavdêrîyên bi vî rengî gelek vekolerên zazakî hemanên *ci*, *pi*, *tiyê* wek cihnav qebûl dikin.

Lê her carê nabe ku li şûna *ciyê* ev cihnav bê bicihkirin. Bo mînak di zazakî da *ci kerdene* ('jê kirin') *PKyek* e û nabe di *vê PKyê* da li şûna *ciyê ey* (nêza)/*aye* (mêza) bê bicihkirin, lewra avahîya *\*ey/aye kerdene*yê (*\*wî/wê kirin*) pêk tê ku nerêzimanî ye. Şanlı (2017, r. 104) di *vê* mijarê da dibêje bergenda *jê reya* kurmancî di zazakî da *ci ra* ye û ew dibêje *ci* dibe ku di eslê xwe da ji *ci+ê*, *ci+ayeyê* [an jî *ci+ey*] pêk hatibe, lê bi guherîneka dengî ve forma *ciyê* wergirtibe. Di *vê* boçûnê da *ci* dibe daçek ku di kurmancî da bergenda *wê* dibe *ji*. Şanlı li heman derê diyar dike ku di hewramî da bergenda *jiya* kurmancî daçeka *ceyê* ye û *vê* jî wek nîşaneka din a têkilîya di navbera daçeka *ciyê* ya zazakî û daçeka *jiyê* ya kurmancî pêşkêş dike.

<sup>10</sup> Forma mantiqî di *BGyê* da li gel k-binyadê yek ji beşên rêzimanê ye ku wateya risteyê diyar dike.

<sup>11</sup> Li gel vê yê ku qebûl dikin pêşdaçek bixwe ROLê bar dikin jî hene. Bo mînak bnr. Haegeman (1998, r. 181); Îbrahîm Elî (2021, r. 85).

<sup>12</sup> Eger ji bo lêkerekê mînak bergenda *wê* ya kurmancî yan jî zazakî nehatiye nîşandan, ew *tê wê* wateyê ku yan bergenda *wê* lêkerê *PKyek* e, yan jî bergenda *wê* heman cure kategorîyê binkategorîze nake yan jî cureya kategorîya ku binkategorîze dike bi awayekî teqez nehatiye tesbîtkirin. Bo mînak bergenda *lîstinê* di zazakî da *PKya kay kerdene*yê ye. *Kay kerdene* wek argument wekî *lîstina* kurmancî *FDyekê* binkategorîze dike, lê ji ber ku cureyên wan cuda ne (anku *lîstin* lêker, *kay kerdene* *PKyek* e), *kay kerdene* li vir nehatiye bicihkirin.

<sup>13</sup> Di kurmancîya standard da rasterast bergenda *vê* avahîyê tune ye, lê di hin herêman da (bo mînak herêma Semsûrê) avahîyên wekî *navê xwe* heye ku dikare bê gotin, heman tiştî ifade dikin. Bo mînak *nameyê ci weş o / krm. navê xwe xweş e*. Çawa ku di avahîya mînaka zazakî da li şûna *ciyê* cihnav tewandî ya kesê/a sêyemîn ê/a yekjimar dikare bê bicihkirin, di avahîya mînaka kurmancî da jî li şûna *xweyê* ev cure cihnav dikare bê bicihkirin: wekî *navê wî/wê xweş e*.

MacKenzie (1966, rr. 54-55) ji bo pêşdaçekên *ba* [*be*] û *jayê* [*ce*] ên hewramî dibêje ew bi *gireyên paşdaçekî* (postpositional suffixes) yên *-ana*, *-ara* û *-awayê* dibin yek û *pêşdaçekên lêkdayî* (compound prepositions) yên *xwedî wateyên nû çêdikin*. Dîsa heman pêşdaçek li pêş cihnavên kesê/a sêyem, cihnavên nîşanê, rengdêr û di hin kombînasyonên (combination) din da bi rêzê wek *p-* û *ç(i)* [*ç(i)*] xuya dikin û dema bi paşdaçekan ve dibin yek wek pêşdaçekên *mitleq* (absolute) kar dikin. Di xebata Baileyê (2018, r. 240) ya li ser goranî (ku hewramî wek dialekteka goranî tê qebûl kirin) da wateya pêşdaçeka *bayê* wek *di...da* (îng. *in*), *li gel* (îng. *with*), *li gor* (îng. *according to/to*), wateya *jayê* jî wek *jê* (îng. *from/of*) hatine nîşandan ku *ba* ji alîyê wateyî ve wekî *biya* kurmancî û *biya* zazakî ye, *ja* bergenda *jiya* kurmancî ye. Hin ji mînakên ku MacKenzie ji bo van rewşan nîşan dide, ku dişibin hin avahîyên zazakî, ev in:

(22)

(i) *ba/p- ...ara : ser* (îng. *on*), *tê ra* (îng. *through*)(ii) *pəra: ser* (îng. *on*)(iii) *ja/ç(i)- ~ çana : tê da* (îng. *in*)(iv) *ja/ç(i)- ... -awa ~ ço: jê* (îng. *from*), (îng. *to*)

Di zazakî da jî *bya* pêşdaçeka *biyê* dema daçek bi cihnavêkê dibe yek wekî di kurmancî (*bi+wi* → *pê*) da dibe *p*. Bo mînak *bi+ey* → *pey*, *bi+ay... (a)* → *pa*. Dîsa bergendên *p-* û *ç(i)* ya hewramî di zazakî da ji alîyê wateyî ve *pi* û *ci* ne. Li gel vê, di zazakî da formên wekî *pi ra* ('tê ra'), *ci ra* ('jê (ra)') hene ku ev mînak hem ji alîyê formê ve hem jî ji alîyê wateyî ve gelek nêzî yên hewramî ne. Ji alîyê din ve li hin herêman formên cuda yên *ciyê* jî hene. Bo nimûne Yıldız (2025, rr. 117-118) dibêje di zazakîya du gundên li ser Licê (Licoke û Beney) da du formên *ciyê* hene: *cê* (nêza), *ca/cay* (mêza). Li gor ku di Kırkanî (2018, r. 184, 186, 195) da cih digire *ciya* zazakî di mewlûda zazakî ya Osman Esad Efendîyî<sup>14</sup> da bi du formên din jî hatiye bikaranîn: *cay* (mêza) û *cey* (nêza).

(23)


- (i) (a) *Jew zî may 'Îsayê, Meryem namê ay* 'Yek jî diya Îsayî, Meryem navê **wê**  
(b) *Ez senîn vajan bi to rindîya cay* 'Ez çawa bejim ji te ra rindîya **wê**
- (ii) (a) *Hewnê cey te'bir kerd merdim ci rê* 'Xewna **wî** te'bir kir (**wî**) mirovî **jê** ra'  
(b) *Kerdo de'wet Xaliqî emšo bi ey* 'Kiriye de'wet Xaliqî îşev ew (**bi wî**)'  
(c) *Bê to biresnan verdê ningandê cey* 'Were te bigihînim ber lingên **wî**'

Di van mînakên (23)yan da li şûna *cay* û *ceyê* em dikarin *ciyê* yan jî li gor zayendê cihnavên *aye* an jî *eyê* bi cih bikin. Bo mînak di (23ib)yê da em dikarin risteyê bi awayê *Ez senîn vajan bi to rindîya ci*, yan jî (23iic)yê em bi awayê *Bê to biresnan verdê ningandê ciyê* çêkin. Mînakên (23)yan rasterast nîşan nedin *cay* û *cey* ji pêşdaçekê (bo mînak daçekê wekî *ce/ciyê* yan jî yeka din) pêk hatine jî, bi ya me têkilîyêkê jî nîşan dide ku *cey* (û lewma jî *ci*) her carê rasterast ne forma tewandî ya cihnav kesê/a sêyem ê/a yekhejmar e. Bo mînak di (23iib)yê da li şûna *bi eyê ci* dikare bê bicihkirin. Di zazakîya Sêwregê da em dikarin bêjin *Mi ci de'wet kerd* ('min ew de'wet kir'). Eger *ci* her carê forma tewandî ya cihnav kesê/a sêyem ê/a yekhejmar be, nexwe divê em bikaribin li şûna *ciya* di vê risteyê da *ey* an jî *ayeyê* bi cih bikin, lê dema em vê bikin binyad bi awayê *\*Mi ey/aye de'wet kerdê* (*\*Min wî/wê de'wet kir*) pêk tê ku nerêzimanî ye. Berevajî vê em dikarin li şûna *wê* cihnav netewandî ya kesê/a sêyem ê/a yekjimar bi cih bikin: *Mi o/a de'wet kerd* ('min ew de'wet kir'). Dîsa li gor ku di Yıldızê (2021, r. 336) da cih digire li hin herêman formên *ca* û *cêyê* hene ku li şûna *cayê ci ra/aye ra* ('jê ra/ji wê ra'), li şûna *cêyê jî ci rê/ înan rê* ('jê ra/ ji wan ra') mimkin e bê bikaranîn. Wek encam di hin rewşan da *ci* wek bergenda forma tewandî ya cihnav kesê/a sêyem ê/a yekjimar kar bike jî wisa dixuye ku *ci* di hin rewşan da ji pêşdaçekê û cihnav kesê/a sêyem ê/a yekjimar pêk tê.

<sup>14</sup> Wek Osman Efendîyo Babij jî tê nasîn. Di sala 1852yan da li Sêwregê hatiye dinyayê, di sala 1928an da wefat kiriye. Di sala 1903an da bi zazakî mewlûdek nivîsandîye (bnr. Kırkan, 2018, rr. 83-85).

Di literaturê da bi giştî zazakî û goranî (hewramî) li gor zaravayên din ên kurdî, nêzîktirî hevûdin tên nirxandin û senifandin (bo mînak bnr. Tan, 2015, r. 19; Khalid, 2020, r. 140). Dema em vê nêzîkahîyê û pêzanînê li jor bi hev ra binirxînin, piçek din rehetir em dikarin *ci, pi, tiyê* zazakî di hin rewşan da wek frêzên daçekî ku ji pêşdaçek û cihnavekê pêkhatî (wekî *jê, lê, pê, têya* kurmançî), qebûl bikin. Wekî me bi mînakên *pey* û *payê* nîşan da pêşdaçeka ku di çêkirina *piyê* da cih digire *bi* ye, lê ji bo diyarkirina pêşdaçeka di *ci* û *tiyê* li ber destê me bi têra xwe pêzanîn tune ne. Ji ber vê em dê ji bo *ciyê* *cyê*, ji bo *tiyê* *tyê* wek pêşdaçekên cîgir ên di van avahîyan da bi cih bikin. Bi kurtasî dema em van hêmanan wek *FD* binirxînin dê forma vekirî ya *ciyê* wek *c+cihnav*, a *piyê* wek *bi+cihnav* û ya *tiyê* jî wek *t+cihnav* be.

Dema em vegerin mînakên (20ii)yan divê em bêjin li k-binyadê *lê* (zz. *ci ra*) bi awayekî vekirî, bo mînak wekî *li+wêyê* (zz. *c+ey+ra*), pêk tê. Li vê astê li *wêyê* (zz. *ey* (nêrza)) ROL tê barkirin. Forma *lêyê* (zz. *ci*) dibe ku li asta forma fonetîk (phonetic form)<sup>15</sup> pêk tê. Ev girîng e, lewra bo mînak di kurmançî da forma navdêrî ya *FLya li pirtûkê nihêrîyê* wek *nihêrîna li pirtûkê*, ya *FLya li wê nihêrîyê* wek *nihêrîna li wêyê* dikare bê çêkirin, lê forma navdêrî ya *FLya lê nihêrîyê* wek *\*nihêrîna lêyê* pêk nayê. Lewma jî em angaşt dikin formên wekî *jê, lê, pê* û *têyê* yên kurmançî û *ci, pi, tiyê* yên zazakî ne li k-binyad û r-binyadê, li asta forma fonetîk pêk tînin. Li jêr dardiyagrama (24i)ê binyada ROLî ya mînaka kurmançî, dardiyagrama (24ii)yan binyada ROLî ya mînaka zazakî ya di (20i)ê da nîşan dide.



Tan (2015, rr. 265-266) van cure lêkerên kurmançî ku *FD*yekê binkategorîze dikin wek lêkerên *bidaçek* bi nav dike. Tan dibêje ev lêker bêyî daçekan nayên kişandin, anku bi serê xwe nayên bikaranîn. Ji ber vê jî bo mînak ew dibêje forma "rastûn" a lêkera *nihêrînê* (di pirtûka wî da *nihartin* e) *lênihêrîn* e. Bi heman awayî ji bo lêkerên wekî *zanîn, lîstin*, formên *pêzanîn, pêlîstinê* diyar dike. Angaşt ku Tan li vir pêşkêş dike tê wê wateyê ku lêkerên ku em dibêjin *FD*yekê binkategorîze dikin, divê di ferhenga kurmançî da li gel temamkerên xwe cih bigirin. Anku di ferhenga kurmançî da li şûna *nihêrîn, zanîn, lîstin* divê formên *lênihêrîn, pêzanîn, pêlîstin* cih bigirin.

Di çarçoveya xebata me da wekî me nîşan da *lêya* ku di risteyê da li gel lêkera *nihêrînê* xuya dike, ne beşeka lêkerê bixwe ye, lê kategorîyek e ku lêkera *nihêrînê* wê binkategorîze dike. Ji vî alîyî ve cudahîya wê ji kategorîyên din ên *FDI* û *FTEMê* tune ye. Eger em vê nihêrîna Tanî qebûl bikin, bersiva wê pirsê tune ye ku çima em *FDyên* wekî *lê, jê, pê, têyê* wek beşeka forma lêkerê dihesibînin, lê formên wan ên vekirî (bo mînak *lê = li wê*) û kategorîyên *FDI* û *FTEMê* nahesibînin? Eger sedema angaşt Tanî

<sup>15</sup> Forma fonetîk, di *BGYê* da binyada fonetîk a risteyan sererast dike.

ew be ku *pê, lê, jê, tê* piştî bûyereka dengî ji *pêşdaçek+cihnavê* pêk hatine û wek hêmaneka hev girtî kar dikin, wê demê ji aliyê rêzimanê ve ew wek pîverek nikare bê qebûl kirin. Lewra ev temamker dikarin bi awayekî vekirî wekî *li pirtûkê* jî pêk bên. Nexwe di vê rewşê da divê em bêjin ev lêker, *li pirtûkê nihêrîn* e, ku ev ne pêkan e.

Bakır (2020, rr. 181-184) jî di bin navê lêkerên biwêjî da hin formên wekî *pê re gotin* (mînak *Min bi wî re got / Min pê re got*), *pev re xwarin* (mînak *Me bi hev re xwar/Me pev re xwar*), *ji zû de hatin, jê re gotinê* wek lêkerên lêkdayî (hevedudanî) dide nasîn. Di van mînakên da bi rêzê hêmanên *pê re, pev re, ji zû de û jê reyê* li gel lêkerên xwe wateyeka nû pêk nayînin. Bo mînak di *pev re xwarinê* da her karê "xwarin"ê heye. *pev re*, bi tenê hêmaneka ku karê "xwarin"ê li gel wî/wê tê kirinê nîşan dide ku di çarçoveya xebata me da zêdek e. Lewma bi ya me ev cure form ne lêker (ên lêkdayî) in.

Ji bo zazakî jî di hin xebatan da hin zêdekên ku li gel lêkerê xuya dikin li lêkerê hatine zêdekirin û hatiye angaştkirin ku ev beşên li lêkerê zêdekirî binyada argumentî ya lêkerê diguherînin. Bo mînak Kırkan (2021, r. 59) lêkera *vateneyê* ('gotin') wek lêkerekê têper (a du argumentî) nîşan dide. Lê Kırkan (2021, r. 63) *cira vateneyê* (*ci û rayê* zeliqandî dinivîsîne) jî bi wateya "ji yekî/ê ra gotin" wek "lêker" eka cot-têper (anku sê argumentî) disenifîne. Bi heman têgehiştinê ew formên *cira perskerdene* ('jê pirs kirin'), *cira heskerdeneyê* ('jê hez kirin') jî wek lêkerên cot-têper disenifîne. Dîsa Demîr (2015, r. 44, 49) jî hêmanên *pazeleqayeneyê* ('pê ve zeliqandin') û *ciravateneyê* ('jê derxistin') dide nasîn. Di ferhenga zazakî ya Capolatî (2006, r. 127) da *ci resnaeneyê* bi wateya "gihandina tiştêkî bi tişt an kesekî" (bergenda *resnaeneyê* di kurmançî da *gihandin* e) cih digire, yek ji wateyên *ci ra vejîayenê* ('jê derketin') jî wek "ji nav derketin" hatiye danasîn. Di vê ferhengê da gelek hêmanên wekî van cih digirin.

Arslan (2016, r. 77) jî *ci ra vateneyê* bi wateya "ji yekî/ê ra gotina tiştêkî" wek "lêker" eka sê-cihî (anku sê argumentî) disenifîne. Wekî me diyar kiribû *ci ra* di kurmançî da bergenda *jê rayê* ye. Eger em li gor vê boçûnê bêjin divê em bêjin di kurmançî da lêkera *gotinê* du argumentî ye û lêkerekê din a di forma *jê ra gotinê* heye ku ev jî sê argumentî ye ku *jê ra* li gel *gotinê* lêkerekê (ya rasttir PKyeka) sê argumentî pêk tîne. Kêşeya herî mezin a nihêrîneka bi vî rengî ew e ku argumenteka (an jî zêdek) lêkerê wek pêkhênêka lêkerê bixwe tê hesibandin ku wekî me dît Tan û Bakırî jî ji bo kurmançî ev tişt kiriyê. Arslan (2018, rr. 10-11) bi heman têgehiştinê dibêje lêkera *kerdeneyê* ('kirin') du-cihî (anku du argumentî) ye, lê lêkera *pi-ra kerdene* ('lê kirin') lêkerekê sê-cihî ya dîtransîtîv (ditransitive) e û ji bo vê mînaka jêrîn nîşan dide.

- (25) *Hosta-y boax-Ø ker-d-Ø bon-i ra*  
hoste-TWNG boyax-XWR kir<sub>BORÎ</sub>-BORÎ-KS3.Y. xanî-TWNG BRP  
'Hosteyî boyax li xanîyî kir' (Anku 'Hosteyî xanî boyax kir')

Di vê mînakê da *bonê* ('xanî') li şûna *piya* di *pi-rayê* da hatiye bicihkirin û ev *bon* wek argumenteka lêkera *pi-ra kerdene* hatiye hesibandin. Nihêrîneka bi vî rengî ji aliyê semantîkî ve vê fikra nakok bi xwe ra tîne: *pi* hem beşeka lêkerê ye ku wateya argumentan diyar dike, hem jî dema ew bi awayekî vekirî pêk tê (di mînakê da *bon*) jî lêkera ku ew bixwe jî beşeka wê ye wateyê distîne. Anku hêmanek hem ROL-barker hem jî ROL-wergir e. Lê hêmaneka ku ROLê bar dike nabe ku ROLê werbigire. Ji aliyê din ve bo mînak dema *pi* di risteya mînak da cih bigire û riste bi awayê *Hostay boax kerd pi rayê* ('Hosteyî boyax lê kir') pêk bê, em dê bêjin *pi* argument e yan beşeka lêkerê ye? Eger em bêjin *pi* argument e, nexwe divê em bêjin ew ne beşeka lêkera *pi-ra kerdene* ye lewma jî lêker bi tenê *ra kerdene* ye, lê wê demê wateya *pi ra kerdene* winda dibe, eger em bêjin beşeka lêkerê ye divê em bêjin ew ne argument e, lewma jî *pi ra kerdene* dê bibe du-cihî.

Berîya her tiştî ji bo ku hêmanek li ser hejmara argumentan û binyada argumentî bandorekê çêbike divê ew li ser wateyê guherînekê pêk bîne. Wateya lêkera *vateneyê* "gotin" e, di forma *ci ra vateneyê* da jî dîsa wateya "gotin"ê heye, wateyeka nû çênebûye. Bi tenê hêmaneka HEDEFÎ (*ci*) ya ku "gotin" ber bi wî/wê pêk tê lê hatiye zêdekirin. Di mînaka *pi-ra kerdene* ya Arslanî da *pi rayê* wateyeka nû çêkiriye. Ji ber ku hêmana ku dibe sedema wateyeka nû *pi ra* bixwe ye, nabe ku beşek ji wê (li vir *pi*

(an jî hêmaneka li şûna wê tê bicihkirin)) wek argument bê qebûlkirin. Berevajî angaştê Arslanî bi ya me *pi ra kerdene* lêkerêka (PK) du-cihî (anku du argumentî) ye, *bona* ku li şûna *piyê* bi cih bûye, hemaneka zêdek e, lewma jî ne argument e. Sedema bicihbûna *bonê* ya li şûna *piyê* ji ber binyada *piyê* der tê ku wekî me nîşan dabû em qebûl dikin ew ji *bi+cihnavê* pêk tê. Di mînakê da *bon* ne ku li şûna *piyê*, di *bi+cihnavê* da li şûna *cihnavê* bi cih dibe, lê ji ber ku di zazakî da forma vekirî ya *piyê* tune ye (anku ji holê rabûye) *pi* ji binyadê dikeve û (ne wisa be jî) wisa xuya dike ku *bon* li şûna *piyê* bi cih bûye. Lê eger forma vekirî ya *piyê* wekî em dibêjin *bi+cihnav* be di mînakê da *bon* dê piştî *biyê* wiha xuya bike: *bi bon-î ra*.

Wek encam ji ber ku di formên wekî *jê ra gotin*, *ci ra vatene* ('jê ra gotin'), *pazeleqneyeneyê* ('pê ve zeliqandin') da bi lêzêdekirina *jê ra*, *ci rayê* û *payê* wateyeka nû pek nayê, angaştê me ew e ku di kurmancî û zazakî da formên bi *vî awayî* ne lêker in û di ferhenga kurmancî û ya zazakî ya lêkerî da cih nagirin. Dîsa di mînakên wekî *pi ra kerdene* da jî *pi* beşeka çêker a PKyê ye, lewma nabe ku ew wek argumenta lêkerê kar bike. *Pi ra kerdene* PKyeka du-cihî (du-argumentî), lewma jî du-ROLî ye, ne ku lêkerêka sê-cihî, lewma jî ne sê-ROLî ye.

### Lêkerên du-Rolî yên ku FD yan jî FTEMekê Binkategorîze Dikin

Ev cure lêker, wek temamker FDyek an jî FTEMekê binkategorîze dikin. Hin mînakên van cure lêkeran ev in: *Karîn* (zz. *eşkayene*), *zanîn* (zz. *zanayene*). Di kurmancî da sereya FDya ku *karîn* û *zanîn* binkategorîze dike *biye*. Ev FD dikare wek *pê* jî pêk bê.

(26)

(i) *Ez [FD bi wê] dikarim / min [FD bi wê] karî*

(ii) *Ez [FD pê] dikarim / min [FD pê] karî*

Yek ji mînakên wê yên bi temamkera FTEMî jî wiha ye:

(27) *Ez şî dikarim [FTEM (ez) vê pirtûkê bixwînim];*

Di zazakî da jî FDya lêkerên vê binkomê wekî di kurmancî da bi pêşdaçeka *biyê* pêk tê. Forma FDyê bi awayê *bi+cihnav* e û dikare wek *pey* jî pêk bê. Li jêr (28) mînakên ji bo lêkera *zaneyeneyê* ya li gel FDya temamkerî, (29) jî mînaka li gel temamkera FTEMî nîşan dide.

(28)

(i) *Ez [FD bi ey] zana / mi [FD bi ey] zana / krm. Ez [FD bi wê] dizanim/min [FD bi wê] zanî*

(ii) *Ez [FD pey] zana / mi [FD pey] zana / krm. Ez [FD pê] dizanim/min [FD pê] zanî*

(29) *mi şî nêzana [FTEM kitabî biwana]; / krm. Min şî nîzanî [FTEM pirtûkê bixwînim];*

### Lêkerên Du-Rolî yên ku FTEMekê Binkategorîze Dikin

Ji bo van cure lêkeran me ji bo kurmancî û zazakî bi tenê lêkera *wêrînê* (zz. *wetardene*) tesbît kir. Ev lêker di rêzimana nerîtî da gelek caran wek lêkera modal (modal) an jî lêkera alîkar tê senifandin. Lê ji alîyê sîntaktîk ve ew wek lêkerêka serbixwe tev digere. Wekî Bülbül (2019, rr. 265-266) jî nîşan dide ev cure lêker (anku lêkerên modal ên wekî *xwestin*, *karîn*, *wêrîn* û hwd.) lêkerên têper (têper) in. Wekî me hin mînakên wan li jor dîtî, ev cure lêkerên ku wek modal tên senifandin, temamkerekê jî binkategorîze dikin ku binkategorîzekirina temamkerekê û hebûna bikerekê, ji cureya temamkerê azade, taybetmendîya lêkerên têper e.

(30) *Ez diwêrim [FTEM pirtûkan bixwînim]/zz. Ez wetarena [FTEM kitabî biwana]*

### Lêkerên sê-ROLî

Ev cure lêker li sê argumentan ROLê bar dikin û du argumentan binkategorîze dikin. Ji her du temamkeran yek li pêş lêkerê yek piştî wê cih digire. Temamkera pêş lêkerê berkara rasterast e, temamkera piştî lêkerê ku berkareka nerasterast e, ROLa wê HEDEF/WERGIR e. Mînakên van lêkeran

*dan* (zz. *dayene*), *şandin* (zz. *şawitene/erşawitene/riştene*), *xistin* (zz. *fînayene*), *avêjtin* (zz. *eştene*), *birin* (zz. *berdene*) in.

Me got argumenta piştî lêkerê HEDEFÎ/WERGIRÎ ye û me ew argument li jor wek *FD* nîşan dabû. Lê divê em diyar bikin ku gelek ji xebatên ku li ser kurmançî hatine çêkirin, hêmana HEDEFÎ/WERGIRÎ ya piştî lêkerê wek *FDI* qebûl dikin. Bo mînak Bülbul (2016, r. 40) ji bo kurmançî dibêje di forma tebatî da hêmana datîv (di xebata me da argumenta HEDEFÎ) bi awayekî mecbûrî ji risteyê tê avêjtin. Eger em li gor nihêrîna wî bêjin di binyada nerêzimanî ya *\*Pirtûk hat dayîn keçikêyê* da sedema nerêzimanîyê hebûna hêmana datîv (*keçik*) e. Lê em angaşt dikin ku sedema vê nerêzimanîyê ne hebûna *keçikê* ye, qebûlkirina wê ye wek *FDI*. Eger ew wek *FD* bê qebûlkirin, ev nerêzimanî pêk nayê. Lewma binyada *Pirtûk hat dayîn bi keçikêyê* (an jî *Pirtûk bi keçikê hat dayîn*) bi awayekî berbelav neyê bikaranîn jî bi ya me em nikarin bêjin ew nerêzimanî ye. Dîsa tê qebûlkirin ku ROLA KARAYê di risteyên tebatî da tê *mêtin* (absorb) (bnr. Haegeman, 1998, r. 182). Bi gotineka din, lêkerên tebatî xwedî ROLA ku li bikerê bikin, ninin. Lêkera *danê* sê-ROLê ye, di forma wê ya tebatî da, ROLA KARAYê jê tê mêtin, lê du heb ROLên wê dimînin ku MIJAR û HEDEF/WERGIR in. Ji ber vê, esas eger em di forma tebatî da hêmana HEDEFÎ/WERGIRÎ jê bibin, dê bibe sedema nerêzimanîyê, lewra dê binyada ROLê ya forma tebatî ya lêkera *danê* bi temamî neyê derdan. Anku dê *Prensîpa Derdanê* (Projection Principle) bê bînpêkirin ku li gor vê prensîpê her cure pêzanîna ferhengî divê li asta sîntaktîk bê derdan (bnr. Chomsky, 1988, r. 29) ku ROL jî yek ji pêzanînen ferhengî yên lêkeran e.

Ji aliyê din ve Îbrahîm Elî (2017, r. 217) ji bo kurmançî (devoka behdînî) di mînaka *Narîne govar da vi Nesrîne* da *vi Nesrîneyê* wek temamkerê *FDyî* ya lêkera *danê* dide nasîn ku sereya wê pêşdaçeka viyê ye. Li gel vê hebûna pêşdaçekê berîya hemanên navdêrî yên piştî lêkerên kurmançî ji aliyê Karacayî (2021, rr. 100-101) ve jî wek ihtimalek hatiye diyarkirin. Ew bi sê mînakên ji zaravayên kurdî yên hewramî, soranî û zazakî nîşan dide ku di hewramî da hêmana ku piştî lêkerê cih digire, hem berîya wê daçek heye hem jî ew ditewe, di soranî da daçek heye, lê tewang tune ye û di zazakî da, ne daçek heye ne jî tewang. Di ser van çavdêrîyan ra Karaca dibêje dibe ku di kurmançî da jî berê li pêş hêmana piştî lêkerê daçek hebûye, lê bi demê ra ew daçek ketibe. Mînakên ku Karaca ji van zaravayan nîşan dide li jêr in ku bergenda wan a kurmançî *Zarok diçin dibistan-ê* ye. Di (31i) a mînaka hewramî da *pey* pêşdaçek, -y gireya tewangê ye, di (31ii) ya mînaka soranî da *bo* daçek e û (31iii) mînaka zazakî ye.

(31)

(i) *Korake malane pey medrese-y*

(ii) *Kurrekan deron bo qutabxane-Ø*

(iii) *Lacekî şinê mekteb-Ø*<sup>16</sup>

Niha jî em lê binihêrin her du temamkerên lêkerê li asta sîntaktîk li kîjan pozîsyonan bi cih dibin. Ji bo diyarkirina vê em dikarin serî li binyada ku Larson (1988, rr. 342-349) ji bo *avahîyên datîv* (dative constructions) pêşniyaz dike, bidin. Pêşî em li analîza Larsonî ya ji bo risteyên wekî yên jêrîn binihêrin.


(32) *John sent a letter to Marry*

John şand yek name bi Marry

'Johnî nameyek şand ji Marryê ra/' Johnî ji Marryê ra nameyek şand'

Larson ji bo van cure risteyan, *FLyeka* du-tebeqeyî ya ku ji du heb *FLyan* pêk tê pêşniyaz dike.

<sup>16</sup> Di vê mînakê da hêmana HEDEFÎ (*mekteb*) wek *FDI* xuya bike jî di mewlûda zazakî ya Osman Esad Efendîyî da (bnr. Kırkan, 2018, rr. 175-202) mînakên ku hemanên piştî lêkerê wek *FD* hatine bikaranîn ne kêman in. Du heb mînak ji wan *Rew şima bêrên bi cennet...* ('Zû hûn werin (bi) cenetê') û *Ef kerê ma û birasî tu bi înan* ('Ef bikî me û bigihîni (bi) wan') in ku ev mînak nîşan didin di zazakî da berîya hêmana HEDEFÎ (*cennet* ('cenet/bihuşt'), *înan* ('wan')) pêşdaçek (*bi*) dikare cih bigire. Ji bo hin mînakên din bnr. Gündüz (2013, r. 52); Kaçan (2018, r. 62). Yıldız (2023, r. 138).




(33), k-binyada beşeka (32)yan e. Wekî di (32)yan da tê dîtin, lêkera *sendê* ('şandin') li pêş *a letterê* ('nameyek') cih digire. Lewma li r-binyadê *send* cih diguhere pozîsyona vala ya *Lya* jorîn (v). Lê divê em bêjin Larson qebûl dike ROL ji aliyê *L'yê* ve li bikerê tê barkirin. Lewma jî li jor ROLA ku li *Johnî* tê barkirin ne ji aliyê *Lyê* ve, ji aliyê *a letter send to Marryê* tê barkirin.

Di îngîlîzî da çawa ku avahîyên datîv ên wekî (32)yan hene, yên wekî jêrîn jî hene. Di van risteyan da hêmana datîv berîya berkara rasterast cih digire.

(34) *I [gave to John]; everything that he demanded* ş;  
 Mîn [da bi John] her tişt ku wî xwest  
 'Mîn her tiştê ku xwest da Johnî'

Li gor Larsonî risteya (34)an bi cihguherîna *gave to Johnî* ya ji dayîwa risteyê, pêk tê (hevîndeksîya *gave to John* û *şyê* vê cihguherînê nîşan dide). Ji bo van cure risteyan jî binyada jêrîn pêşniyaz dike.



Eger em bala xwe bidinê di (35)an da wekî mînaka pêşîn lêker û *FDyê* (*give +to John*) *L'* pêk neanîne, lê ew di *Lyekê* da dibin yek. Analîzeka bi vî rengî piştî xwe dide rêzikeka ku Larson wê wek *Veanalîza L'yê* (V' Reanalysis) bi nav dike. Ev rêzika wî bi kurtasî dikare bi awayê jêrîn bê pênasakirin (ji pênaseya Larsonî hatiye lihevanîn).


(36) *Veanalîza L'yê*

Frêzeka Ayê ya *L'yê* dema yek ji *ROLên* xwe yên hundirîn nehewîne wê demê ew wek *L* dikare bê veanalîzkirin.

Di (35)an da lêker xwedî du heb *ROLên* hundirîn e, yek a *everything that...ê* ya din a *Johnê* ye. Di nav *Lyê* da bi tenê *ROLa Johnê* pêk hatiye, lewma jî *ROLa* din di nav wê da cih nagire. Ji ber vê jî ew wek *L* ji nû ve hatiye analîzkirin. Ev *Lya* ku ji *give+to Johnê* pêk tê, li r-binyadê cih diguhere bo pozîsyona vala ya *Lya* jorîn û risteya (34)an pêk tê.


Di xebata xwe da em qebûl dikin ku *ROLa* bikerê ji aliyê lêkerê ve tê barkirin (wekî me got Larson qebûl dike *L'ROLa* bikerê bar dike). Dîsa di kurmancî û zazakî da hewce nake di avahîyên datîv da lêker cih biguhere. Li gel vê, ji bo lêkerên sê-*ROLî* yên kurmancî û zazakî bi hin guhertinan ve, em dikarin *veanalîza L'yê* ya Larsonî bi kar bînin. Em dê binyadeka du-tebeqeyî bi kar neyînin, binyada ku em pêşniyaz dikin dîsa ji *FLyekê* pêk tê, lê berîya ku em binyada ku em pêşniyaz dikin, nîşan bidin divê em pozîsyonên berkara rasterast û temamkera HEDEFÎ/WERGIRÎ diyar bikin. Wekî li jor tê dîtîn Larson argumenta HEDEFÎ/WERGIRÎ li pozîsyona xwişkî ya lêkerê bi cih dike. Lê em dê temamkera berkara rasterast (anku argumenta MIJARÎ) li jêr argumenta HEDEFÎ/WERGIRÎ li pozîsyona xwişkî ya lêkerê bi cih bikin. Grimshaw (bnr. 1991, r. 41) wek temamkera herî nêzîk a lêkerê, argumenta MIJARÎ bi cih dike. Argumenta HEDEFÎ/WERGIRÎ jî di rêza duyem da bi cih dike. Em jî vê bicihkirina Grimshawê ji bo lêkerên sê-*ROLî* yên kurmancî û zazakî bi kar tînin. Di encamê da binyada ku em pêşniyaz dikin bi awayê jêrîn e.

(37)



Dardiyagrama (37)an piştî xwe dide vê: Çawa ku di lêkerekê du-*ROLî* da hêmana temamker dike ku *L* têr bibe û wek *L'* pêk bê, bi heman awayî dema lêker sê-*ROLî* be jî, du heb ji van *ROLan* temamker in û ji ber ku têrbûna *Lyê* bi temamkeran ve dabîn dibe, divê her du temamker jî li bin *L'yê* bi cih bibin. Binyada (37)an vê hewcedariyê dabîn dike. Li gor vê, di (37)an da lêkera *Xê* û frêza *Yya* MIJARÎ dibin yek û *Lyê* pêk tînin, lewra *L* hêj ji bo ku *L'yê* pêk bîne têr nebûye. Ev têrbûn dema *Zya* HEDEFÎ/WERGIRÎ li pozîsyona temamkerî ya *Lyê* bi cih dibe, pêk tê. Piştî vê *L'* pêk tê. Wekî lêkerên din hêmana bikerî jî dîsa li pozîsyona nîşankerî ya *FLyê* cih digire.

Di kurmancî û zazakî da yek ji lêkerên sê-*ROLî* ya berbelav lêkera *danê* (zz. *dayene*) ye. Eger em ji bo risteya *Dîlanê pirtûk da hevala xweyê* (zz. *Dîlane kitab da embaza xo*) dardiyagremeka li gor ya (37)an çêkin dê wiha be:



Di (38)an da lêkera *danê* ROLê hem li *pirtûka* (zz. *kitab*) li pozîsyona xwe ya xwişkî, hem (li gel pêşdaçekê) li *hevala xwe* (zz. *embaza xo*) ya li pozîsyona xwe ya temamkerî hem jî li *Dilana* bikerî ya li pozîsyona xwe ya nîşankerî bi cih bûye, bar dike<sup>17</sup>.

### Encam

Di vê xebatê da em li ser binyada ROLê ya lêkerên têper ên kurmancî û yên zazakî rawestîyan. Binyada ROLê ya lêkeran me di çarçoveya *Teorîya ROLê* da vekola. Teorîya ROLê yek ji binteorîyên *Teorîya Birêvebirin û Girêdanê* (GB:BG) ye ku ji aliyê Noam Chomskyî ye hatiye pêşkêşkirin. Me hêmanên lêkerî wek "lêker" û "pêveberên kompleks" destnîşan kirin û em bi tenê li ser binyada ROLê ya "lêker"an rawestîyan.

ROL, taybetmendîyeka semantîk e ku lêker li argumentên xwe bar dîkin. ROL bixwe têkildar be bi sematîkê jî lêbarkirina ROLan têkildar e bi sîntaksê. ROLên ku li argumentan tîn barkirin, li k-binyadê li hin pozîsyonên sîntaktîk ên diyar tîn barkirin. Lêker li argumentên ku li pozîsyona nîşankerî û ya temamkerî (û xwişkî) cih digirin ROLan bar dîkin. Argumenta lêkerê ya li pozîsyona nîşankerî her carê wek *FDI*yek pêk tê, ew li r-binyadê cih diguhere bo pozîsyona nîşankerî ya *FDEMê* û li wê derê peywira bikertîyê bi cih tîne.

Cureya kategorîk (wekî *FDI*, *FD* û hwd.) a argumentên lêkerê û ROLên ku lêker li van argumentan bar dike, binyada ROLê ya lêkerê pêk tîne. Di kurmancî û zazakî da lêkerên têper wek argument kategorîyên *FDI*, *FD* û *FTEMê* binkategorîze dîkin. Hin ji lêkeran bi tenê yek cure kategorîyê binkategorîze dîkin, hinek ji wan jî kategorîyên cuda binkategorîze dîkin. Ev rewş ji bo argumenta temamkerî derbasdar e. Wekî me got, argumenta bikerî her carê wek *FDI* pêk tê. Bo mînak lêkera *xwendinê* wek temamker bi tenê *FDI*yekê binkategorîze dike û li wê ROLê bar dike, lê lêkera *dîtinê* hem dikare *FDI*yekê hem jî *FTEMekê* binkategorîze bike û li wan ROLê bar bike.

Di encama xebatê da hat dîtin ku di kurmancî û zazakî da lêkerên têper li gor hejmara ROLan du kom in: *Lêkerên du-ROLê* û *lêkerên sê-ROLê*. Lêkerên du-ROLê li gor cureya kategorîyên ku

<sup>17</sup> Di kurmancî û zazakî da avahîyeka bi navê *avahîya dançêker* (causative construction) jî heye. Ev avahî bi alîkarîya lêkera *danê* (zz. *dayene*), ku xwedî kêş e û lêkera bingehîn ku di forma raderî da ye, pêk tê. Bo mînak *Dilanê pirtûk da xwendin*. (zz. *Dilane kitab da wendene*). Avahîya dançêker li ser binyada argumentî bandorê çênake. Risteyên heman lêkerê di forma wê ya demdar û forma avahîya dançêker da xwedî heman binyada argumentî ne. Bi tenê li ser ROLa bikerê bandorek pêk tê. Bo mînak di risteya *Dilanê pirtûk xwendê* da ROLA *Dilanê* KARA, ya *pirtûkê* MIJAR e, lê di risteya dançêker a *Dilanê pirtûk da xwendinê* da li gel ku ROLA *pirtûkê* cardin MIJAR e, lê ROLA *Dilanê* SEDEM (CAUSE) e. Ji ber ku guherîn bi tenê di warê cureya ROLê da pêk tê, me di xebatê da avahîya dançêker ji aliyê binyada ROLê ve analîz nekir.

binkategorîze dîkin pênc cure ne: Koma yekem bi tenê *FDIyekê* binkategorîze dike (wekî *xwendin* (zz. *wendene*), *nivîsînê* (zz. *nuştene*)), koma duyem wek alternatîf *FDI* yan jî *FTEMekê* binkategorîze dike (wekî *gotin* (zz. *vatene*), *dîtinê* (zz. *diyene*)), koma sêyem bi tenê *FDyekê* binkategorîze dike (wekî *nihêrînê* (zz. *ewnîyayene*)), koma çarem *FD* yan jî *FTEMekê* binkategorîze dike (wekî *karîn* (zz. *eşkayene*), *zanîn* (zz. *zanayene*)) û koma pêncem bi tenê *FTEMekê* binkategorîze dike (wekî *wêrînê* (zz. *wetardene*)).

Di hin xebatan da ji bo lêkerên ku me got *FDyekê* binkategorîze dîkin, ev argumenta *FDyî* wek beşeka lêkerê hatiye hesibandin. Bo mînak forma lêkera *nihêrînê* wek *lênihêrîn* hatiye qebûl kirin. Me bi binyada *ROLî* nîşan da ku ev *lê* temamkera lêkerê ye, lewma jî nabe ku bibe beşeka lêkerê. Dîsa ji bo kurmacî û zazakî di hin xebatan da argumentên (an jî zêdek) lêkerê li lêkerê hatine zêdekirin û hatiye nîşandan ku van beşên lêzêdekirî binyada argumentî ya lêkerê guherandiye yan jî ev form wek lêkerên lêkdayî hatine danasîn. Bo mînak *jê re gotin* (zz. *ci ra vatene*). Me angaşt kir ku di van cure forman da wateyeka nû pêk nayê, lewra her wateya "gotin"ê heye. Ji ber ku wateyeka nû pêk nayê, ne li ser binyada argumentî guherînek pêk tê, ne jî ew wek lêkerên lêkdayî dikarin bînen senifandin. Lewma jî di ferhenga lêkerî ya kurmacî û ya zazakî da ev cure form wek lêker cih nagirin. Dîsa di hin xebatan da ji bo *PKyên* wekî *pi ra kerdneyê* ('lê kirin') hatiye nîşandan ku ew sê-argumentî ne. Sedema wê jî ew e ku dema ev *PK* di risteyê da cih digirin li şûna *piyê FDIyek* cih digire. Me angaşt kir ku *pi* pêkhêneka *PKyê* ye, lewma jî, li şûna wê *FDIyek* bê bicihkirin jî nabe ku ev *FDIya* bicihkirî wek argument bê qebûl kirin. Lewra argument *ROL-wergir* in. Eger *pi* beşeka *PKyê* ye, nexwe ew beşeka *ROL-barker* jî. Ji ber ku nabe ku hêmanek hem *ROLê* bar bike hem jî *ROLê* werbigire me angaşt kir ku *PKya pi ra kerdneyê* du-argumentî û du *ROLî* ye.

Lêkerên sê-*ROLî* du temamkeran binkategorîze dîkin. Ji her du temamkeran yek li pêş lêkerê yek piştî wê cih digire. Temamkera li pêş lêkerê berkara rasterast e, temamkera piştî lêkerê ku berkareka nerasterast e, *ROLa* wê *HEDEF/WERGIR* e. Mînakên van lêkeran *dan* (zz. *dayene*), *şandin* (zz. *riştene*) in. Di xebatên li ser kurmacî da argumenta *HEDEFî/WERGIRÎ* ya piştî lêkerê bi giştî wek *FDIyek* hatiye nîşandan, lê me di vê xebatê da angaşt kir ku kategoriya wê *FD* ye. Sedemên vê me bi mînakên hin zaravayên kurdî (hewramî, soranî), devoka behdîni ya kurmacî û *ROLê* nîşan dan. Dîsa di zazakî da jî gelek mînak hene ku nîşan didin hêmana *HEDEFî/WERGIRÎ* ya piştî lêkerê wek *FD* jî pêk tê.

## Çavkanî / References

- Abney, S. P. (1987). *The English Noun Phrase in its sentential aspect*. MIT.
- Akgül, H. (2024). *Fraz di Kurmancî de* (Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî). Zanîngeha Bîngolê Enstîtuya Zimanên Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî.
- Arslan, İ. (2016). Zaza Dilinde Ergatif Sistemin Tarihi Gelişimi. *Munzur Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 4(8), 63-87.
- Arslan, İ. (2018). The valency and semantic roles in Zaza Language. Di nav D. Köse (Ed.), *Innovative Approaches in Philology* da (rr. 7-25). Gece Kitaplığı.
- Bailey, D. (2018). *A grammar of Gawraji Gûrânî* (Teza Doktorayê ya Neçapbûyî). Philosophischen Fakultät der Georg-August-Universität Göttingen.
- Baker, M. C. (1988). *Incorporation: A theory of grammatical function changing*. Chicago: University of Chicago Press.
- Bakır, A. (2020). *Rêzimana Kurmancî*. Ankara: Weşanên Ar.
- Baluken, Y. (2019). *Hetê Gramerî ra Fekê Çewlîgî* (Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî). Unîversîteya Artuklu ya Mêrdînî Enstîtuya Ziwananê ke Tirkîya de Cîwîyenê Şaxê Mayzanistê Ziwan û Kulturê Kurdan.
- Baran, B. (2018). *Rêzimana Kurmancî*. Amed: Weşanên Wardozê.
- Bülbül, M. (2016). Risteyên Peywendiyê û Peyvrêzîya Wan (Devoka Mêrdînê). *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 2(4), 22-45.
- Bülbül, M. (2019). Risteyên Alozi di Kurmancî da. *Humanities Journal of University of Zakho*, 7(2), 263-273.
- Canpolat, M. (2006). *Zazaca-Türkçe Sözlük*.
- Carnie, A. (2013). *Syntax A Generative Introduction Third Edition*. Wiley-Blackwell.
- Chomsky, N. (1976). *Studies On Semantics In Generative Grammar (Third Printing)*. The Hague-Paris: Mouton.
- Chomsky, N. (1982). *Some Concepts and Consequences of the Theory of Government and Binding*. Cambridge: The MIT Press.
- Chomsky, N. (1986). *Knowledge of language: Its Nature, Origin, and Use*. New York: Praeger.
- Chomsky, N. (1988). *Lectures on Government and Binding The Pisa Lectures*. Dordrecht-Holland/Providence RI- U.S.A.: Foris Publications.
- Chomsky, N. (2015). *The Minimalist Program* (20th Anniversary Edition). Cambridge, MA and London: The MIT Press.
- Cook, V. J., & Newson, M. (2007). *Chomsky's Universal Grammar: An Introduction* (Third Edition). Blackwell Publishing.
- Dabir-Moghaddam, M. (1997). Compound verbs in Persian. *Studies in the Linguistic Sciences*, 27(2), 25-59.
- Demîr, P. (2015). *Zazakî de Derheqê Awanî û Antişî yê Karî Ser Yew Cigêrayîş* (Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî). Unîversîteya Çewlîg Esnîtuya Ziwanê ke Cuyenî Şaxê Zanistî Bingeyî yê Edebiyat û Ziwanê Zazakî.
- Farqînî, Z. (2019). *Lêker û Rastnivîsa Wan (Ji Alîyê Binyatî ve)*. Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Goldberg, A. E. (1996). Words by Default: Optimizing Constraints and the Persian Complex Predicate. Di nav *Proceedings of the Twenty-Second Annual Meeting of the Berkeley Linguistics Society: General Session and Parasession on The Role of Learnability in Grammatical Theory* da (rr. 132-146).
- Grimshaw, J. (1991). *Argument Structure*. The MIT Press.

- Gültekin, S. (2019). *Hevokên Temamker ên Berkarî yên Kurmancî yên Devoka Torê* (Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî). Zanîngeha Mardîn Artuklûyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Çand û Zimanê Kurdî.
- Gündoğdu, S. (2011). *The Phrase Structure of Two Dialects of Kurmanji Kurdish: Standard Dialect And Muş Dialect* (Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî). Boğaziçi University.
- Gündoğdu, S. (2015). Noun-Verb Complex Predicates In Kurmanji Kurdish A syntactic account. *Proceedings of ConSOLE XXIII*, 279-301.
- Gündoğdu Yücel, S. (2018). *Argument-Adjunct Distinction in Kurmanji Kurdish* (Teza Doktorayê ya Neçapbûyî). Boğaziçi University.
- Gündüz, D. (2013). *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Kirmancca//Zazaca Dil Dersleri*. İstanbul: Vate Yayınevi.
- Haegeman, L. (1994). *Introduction to Government and Binding Theory* (Second Edition). Oxford: Blackwell Publishers.
- Haegeman, L., & Guéron, J. (1999). *English Grammar a generative perspective*. Blackwell Publishers.
- Horrocks, G. (2013). *Generative Grammar*. London and New York: Routledge Taylor & Francis Group.
- Îbrahîm Elî, V. (2017). Tewawker di Girêyên Lêksîkî da. *Govarî Zanko bo Zanîste Mirovayetîyekan*, 21(5), 209-219.
- Îbrahîm Elî, V. (2021). Rolên Watayî yên Argumentên Karî (Di Govera Behdînî da). *Govara Zankoya Dihok (Zanîstên Mirovayetî û Komelnasî)*, 24(2), 78-93.
- Încekan, A. (2014). *Ez Kurdî Hîn Dibim Geçişli Fiiller ve Ergativ Teori-Fiil Dökümü-Alıştırmalar*. Stenbol: Nûbihar.
- Kaçan, M. E. (2018). *Zazakî de Kategorîzekerdişê Edatan û Metnanê Zazakî ra Nimûneyî*. Unîversîteya Artuklûyî ya Mêrdînî Enstîtuyê Ziwananê Ganîyan yê Tirkîya Şaxê Mayzanîstê Ziwan û Kulturê Kurdan.
- Karaca, F. (2021). Rewşên Rêzimanî yên Kurdiya Kurmancî. Di nav A. Kirkan & M. Yonat (Ed.), *Rêzegotarên Zimannasîya Kurdî Destpêk û Têgehên Sereke* da (rr. 91-111). Wan: Peywend.
- Khalid, H. S. (2020). Kurdish Language, Its Family and Dialects. *Kurdiname*, (2), 133-146.
- Kırkan, A. (2018). *Bîyîşa Pêxemberî ya Osman Esad Efendî û Destpêkê Edebîyatê Klasîk yê Kirmanckî*. İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.
- Kırkan, A. (2021). *Zazakî de Kar*. Van: Peywend.
- Larson, R. K. (1988). On the Double Object Construction. *Linguistic Inquiry*, 19(3), 335-391.
- MacKenzie, D. N. (1966). *The Dialect of Awroman (Hawrāmān-ī Luhōn) Grammatical sketch, texts and vocabulary*. København: Det Kongelige Danske Videnskabernes Selskab.
- Megerdooian, K. (2001). Event Structure and Complex Predicates in Persian. *The Canadian Journal of Linguistics / La revue canadienne de linguistique*, 46(1-2), 97-125.
- Radford, A. (1988). *Transformational Grammar A First Course*. New York: Cambridge University Press.
- Stowell, T. A. (1981). *Origins of Phrase Structure* (Teza Doktorayê ya Neçapbûyî). Massachusetts Institute of Technology.
- Şanlı, E. (2017). *Têvernayîşê Kurmanckî û Zazakî: Nimûneyê Licê û Hezanî* (Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî). Unîversîteya Artukluyî ya Mêrdînî Enstîtuya Ziwananê Ganîyan ê Tirkîya Şaxê Mayzanîstê Ziwan û Kulturê Kurdan.
- Tan, S. (2015). *Rêzimana Kurmancî*. İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Todd, T. L. (2008). *A Grammar of Dimili Also Known as Zaza*. Electronic publication.
- Werner, B. (2012). Morphological Sketch of Southern Zazaki spoken in the area of Çermik, Çüngüş, Siverek. *SIL International*.

- Yıldız, P. (2023). *Dimilîyê Modanî û Fekê Înan* (Teza Doktorayê ya Neçapbûyî). Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı.
- Yıldız, P. (2025). Morphological Characteristics of the Lice Dialect in the Zazaki. *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 13(1), 92-130.
- Yıldız, P. (2021). Muqayesekerdişê Zemîran Varyasyonanê Kurdî de. Di nav A. Kirkan & M. Yonat (Ed.), *Rêzegotarên Zimannasîya Kurdî Destpêk û Têgehên Sereke* da (rr. 321-339). Wan: Peywend.
- Yonat, M., & Aslanoğlu, O. (2023). Analîzek li ser Avanîya Ergatîfê -Devokên Kurmancî yên Başûrê Rojhilat, Bakûr û Başûrê Rojava. *Kovara Kurdinameyê ya Navneteweyî*, (8), 13-40.